


Nûredîn Baksî

(Mele Ciwan)

Gotinên Mezinan



HAN Wêje

Institut kurde de Paris

Gotinên Mezinan * Nûredîn Baksî

Institut kurde de Paris

Gotinên Mezinan * Nûredîn Baksî

Çapa 1.

Berlîn/21 Îlon 2013

Wêje-Gotinên Mezinan

Berg Design: Zagros Baran

Çap û Girêdan:

HAN-GRAFİK

han-grafik@hotmail.de

ISBN 978-3-942735-33-9

Institut kurde de Paris

Nûredîn Baksî
(Mele Ciwan)

Gotinên Mezinan

Institut kurde de Paris

Han Weje

Institut kurde de Paris

Pêşgotineke pêwîst...

Her çî qas di pêşgotina vê pirtûkê de agahiyeke berfireh hatibe dayîn jî, wisa bawer dikim ku îlaweyeke kin dê baştir be. Wekî ku di pirtûka yekem ya bi navê "Xewnerojka min" de hatibû diyarkirin, nivîsandina vê berhemê di destpêka salên 70'yan de pêkhatibe jî, weşandina wê di sala 2013 de bi derfet bû. Sedema ewil ya vê rewşê jî, ev bû ku zimanê Kurdî û xebatên di vî warî de di wan deman de qedexe bû û jiber vê yekê jî ev berhemên bi nîrx bi salan di binê axê de hatibûn parastin. Bi taybet di Darbeya 12 Îlonê de nivîskarê van berhemên Nûredîn Baksî dê hatiba girtin û demeke dirêj zulim, şikence, heps û sirgûn dê bibûya para wî.

Bi hewildanên mezin û ezayên bêdawî, piştî bi çend carên serîlêdanên fermî her çî qas di sala 1991 de vegera ser axên welatê xwe pêkanîbe jî, umrê wî yê kin têrê nekir ku berhemên xwe yê bin axê de riziyayî ne berdewam bike, û wan bi xwendevanên xwe re parve bike.

Wek keça nivîskarî min jî li gor zanebûn û derfetên xwe hewil da ku vê erkê pîroz bicîh bînim. Vê karê de ez çî qas serkeftî bûme, ew jî êdî dimîne ji texdîra xwendevanên Kurd re. Di vî warî de jî bi taybet dixwazim îfade bikim ku ez gelek spasî bo hevjinê xwe yê birêz Tekîn Elçî diyar dikim ku wî hem dîtina weşanxaneyekê û hem jî di her xebatên vî amadekirina vê pirtûkê de alîkarî û keda xwe teksîr nekir û her dem li gel min helwesta xwe nîşan da.

Di ji nûve nivîsandina vê pirtûkê de ez gelek hestên cûda cûda jiyam, di hin hevokan de bi êş, hinekan de şad û di hinekan de jî bi rûmet bûm. Sedema yekem ya êşa min jî ev bûbû ku bavê min wisa zû û bêwext çûbû ser dilovaniya xwe û heyacana asta îroyîn ya ku milletê Kurd afirandiye nejîya. Lê ez pê gelek birûmet im ku wî di demên wisa dijwar de li hember ewqas tedayî û zordariyan jî li berxwe daye û berhemên wisa binirxafirandine û layiqê gelê xwe bûye.

Bi vê wesîleyê careke din ez wî bi rêz û hurmet bibîrtînim û dibêjim bila rihê wî şad, cihê wî bihişt be.

Nesîbe Baksî Elçî

***Çend gotin di bara gotinên mezinan de
(We yan pendê pêşyan)***

Gotinên mezinan weya pendê pêşyan, zaniş û çandî û diyariyên pir bilind û gewre ne. Ji pêşî û bav û kalan ev gotinên hêja û bi rewş ji me însanan re mane diyarî û mîrate. Ev gotinên bê hempa ji hiş û mejiyên mirovên rewanpak û bijare û tûjzeka derketine. Ev însanên mezin û rewanpak, hayraz (îlham) û tecrûba xwe ji tevgera bûyerên komelî û xwezayî, li gora jêtiş (istîdat-kabiliyet) û têgehîtin (îdrak) pêgehîtin (anlak) nav xwe pejilandine û veçirane û pişkafîne. Ji dil û can dên û bala xwe dane ser tevgera bûyerên komelî û xwezayî, heta ku jêderek (netîce) rast û dirist, bi destê xwe xistine û bi gotinên kurt û xweşwezîn îfada merama xwe kirine. Di çandîya her gelan de gotinên mezinan di qora pêşîn de cîhekî mezin girtiye û digire. Lewra evan, şax û hêmenên (ûnsûr) çandî ne. Wekî çîrok, metelok, stran, goranî, dilok û lawjen. Bi gotinên mezinan, çîrok, metelok, stran û bi yên dimayînan dang û sewiya pêşve çûn û şaristaniya her gelê ku di qada mêjûyê de bihûrîne tê pîvan. Hema wisa gotinên mezinan, pîvanok in jibo jêtiş û hiş û zeka, engaşt (xeyal) têgehiştin, ditin, zanîn, evînî, heskirina ji xwezayê û tevgera giyanî û civaknasî pêşveçûn û şaristaniya her milletê ku xwediyê van tiştên nemir e.

Gotinên mezinan, zanişeke xwezayî ye. Bi diyarbûna gelan, ew jî diyar bûne. Ji wan re qutabîxane, dibistan û dem û dezgehên zanîne ne lazim bûne. Her cîh ji wan re qutabîxane û dibistan bûye. Li ber qûçik û tifikan li dora

tenûran, di kom û civaten de hatine gotin û hatine hokirin. Ne taybetê bi ref û malbat û ajaran ve bûne. Her kes; çi mezin çi biçûk, çi mêr û çi jin, çi feqîr çi maldar, hemî cûreyên însanan ji wan xwedan par bûne. Û ji wan pêjnên rind hildane. Wana devan ji devan hildane. Bi vî awayî ji wendabûnê rizgar bûne. Pêşî û bav û kalên her milletan van yadîgariyên qedirbilind û nemir ji yê n pişt xwe re pêşkêş kirine. Dinya wanan bi van gotinan dane ronîkirin û rewşenkirin. Pêşî û bav û kalên gelê Kurd ji vî ustubarê (erk-wazîfe) bi awekî xurt û çak û rind bi cih anîne. Ewan jî bi van gotinên canbexş, دنیا gelê Kurd ronî û rewşen kirine. Ji pêşiyên milletên dinan paş de nemane. Ewan jî van gotinan ji yê n pişt xwe re, ji law û neviyên xwe re pêşkêş kirine. Bi van gotinên wan jêtiş û wêriş (cesaret) û hiş û zekaya gelê Kurd tê pîvan. Ji wan ev jî tèn zanîn ku gelê di dewrên mêjûyê de xwedî zanîn, hûner, pêşveçûn û şaristanekiyeke mezin bûne. Û ev nezanîn û belengaziya ku tê de ne, dawî li wan peyda bûye...

Pêşî û zanayên milletê Kurd jî hayraza xwe ji rewş û tevgerên civakî û xwezayî hildane. Di bara her tiştî de gotinek ji van gotinên qedirbilind hatiye bi kar anîn.

WEKOK; (mînak)

Xebat û Betalî :

Xebat ker e, bajo here.
Xizmet e, bê minet e.
Çavê li deriya, xwelî li seriya.

Xirabî û Qencî

Ji xiraban re xew çêtir e.
Qencî qencî tîne.

Bext û Bêbextî

Bext nadin bi text.
Bext kela mêra ye.
Bêbext pirr be ser de derbas nebe.

Malbatî (Ajari)

Jin û mêr tevr û bêr.
Çi bi bêhne nanê germ, çi bi quwete hespê nêr, çi
şirîne jin u mêr.

Dijminayî û Dostînî

Rê dibe bost dijmin nabe dost.
Neyarê bava nabe dostê lawa.
Dostê kevin hespê zîn kiriye.

Mêranî û Qelsemêrî

Bila meriv mêr be bila şev û rojek li dinê be.
Ji qelsemêran weye ku laşê xweşmêran naêşe.

Xwendin û Nexwendin

Alimek alemek.
Her tişt tişteke e, sergîn ji tişteke e,
lê cahîlî ne tişteke.

Xîzanî û Dewlemendî

Sê payê xîzanî tê ji nezanî .
Feqîrtî jenda mêran e.
Kesadî dike fesadî.
Malê dinê stûrê mêran e.

Rojên Ba û Bager

Xaç û Xizirnebî, wey li wî li mala xwe nebî,
jina wî dimîne jinebî .

Zîp im zîpedar, ger bibarim xweş bihar,
ger nebarim, xenîmê kavir û gîskên bijar.
yan jî
ger nebarim hişkiyeke xedar.

Dêrendêz e, yan dêz yan rêz e.

Gîsk im gîskelor, dûv ji bezê xistiye kilor
Herdu Çirî û Kanûn çûne, Sibat û Adar
çi tira min e.

Barîn û Nebarîn

Ewr çû Botan, rabine cotan.
Ewr çû Wanê rabine banê.

Bîstê Nîsan tîne zivistan.
Dehê Gulan axir zeman.

Avketina Daran

Duwazdehê Adarê av kete darê.
ûwd...

Di qada çandiyê de gelê Kurd ji milletên der û dorên xwe û milletên dinan paş de nemaye. Ez bê guman wisa bawer dikim ku çandiya Kurdî ji rewşenbîriya der û dorên xwe angoyê; Erebi, Tirkî û Farisî xurttir e. Eger bête berhevkerin û pêgerek (lêkolîn) baş li ser bête kirin, dikarim bêjim ku ji wan dê gelek xurttir û dewlemedntir be. Lê ev karê hanê gelek zor û bi cefa ye. Lewra Kurdistan di navbêna çar dewletan de hatiye parvekirin û dagirtin. Her çar jî fiq, mijok û kedxwar in. Dest danîne ser ziman û rewşenbîrî û mafê wan yên komelî, aborî û rêzanî (konevanî-siyasî), bi taybetî bêtir di Kurdistana Tirkîyê de. Têkeli û danûstandin di navbêna çar parçeyan de ji bin birîne. Jiber vê qasê berhevkerin û pêgera li ser vî zimanî pir zor û zehmet e. Gelek jî ji çandiya vî zimanî maye di bin tarîtiya nezanînê de. Bi bîr û bawerî im ku dê demên xweş û bi rewşen bîrî û ev doz dê bêne pişkafîn.

Lê Erebi, Tirkî, Farisî ne wiha nin. Çi bin li ber çavan in û veşartiyên wan tev derketine maydanê. Zaf û hindik, bi rewşenbîrî û zimanên wan her sê milletan dizanin û bi wan agahdar in. Di gel ku ew nûjen bûne û Kurdî jî hê nû destpêkiriye ku ji tarîtiyê derdikeve. Dema ku meriv wan û Kurdî rûkarî hev dike Kurdî ji wan xurttir tê xûyan. Lewra jî jêtişî ku di zimanê Kurdî de heye, ji pêşveçûn û pirsçêkirinê re pir li rê ye. Lewra ev ziman zimanekî xwezayî ye. Ango li gora hebûyên xwezayî, pirsên wî hatine çêkirin. Ango li gora reng, deng, hişkati, nermatî, germîti, sermatî û tevger û rewşa hebûyên xwezayî hatine çêkirin û sazîkirin. Ev jî dide nîşan ku milletê Kurd xwezayê pir evandiye. Pir nêzê wê bûye û

dên û bala xwe rind daye ser xwezayê û gelek pê hogir
bûne û təkeliyek çak û rind di navbêna xwe û xwezayê
de dane sazkin.

Navên dengan, di Kurdî de pir in, bi sedan in.

Vekok (Mînak)

Xuşên, guşên, xişên, hirmên, gurmên, qorên, qîrên,
şiqên, fiqên, fikên, qurên, zûrên, tirpên, zirpên, kirtên,
xirpên, çingên ûwd...

Min gelek ji van dengan berhev kiriye û di dawiya
ferhenga xwe de nivîsandiye.

Lê di Erebi de ku ji wan re dibêjin, Esmâ-ul-eswat,
pir hindik in. Yê ku hene jî ne li gora dengên ku
hebûyên xwezayî derdixin.

Vekok (Mînak)

Edes: Ku ji ajotina hêstiran re tê gotin; bi Kurdî ço
yan jî çû ye. Sehiyl: Ku jibo hêrîna hespan re tê gotin; bi
Kurdî hêrîn tê gotin. Dewiyye; ku ji dengê mêşan re û ji
gurêna ewran re tê gotin; bi Kurdî: vizên ji dengê mêşan
re, ji ewran re jî gurên tê gotin.

Bi Xwedê kin, pak dêna xwe bidin ser van pirsan:
(Tir li ku, das li ku?) Û wek vanan. Ev taybetiyên ku ji
Kurdî re heye, ji van sê zimanan re tunînin. Yek jî
zimanê Erebi zimanekî pir zor e. Bê zêr, zeber û pêşan
nahêt zanîn. Dema ku meriv guhdariya xeberbêjan

(radyo) dike, di peyvandinên wan de li gora rêzimana Erebî pir çewtî tên dîtin. Jiber ku bê zêr, zeber û pêş tê xwendin.

Nav û dengên Erebî jiber ku zimanê Qur'anê ye, di nav misilmanan de pir qedirbilind bûye. Her cûrên milletê îslamê, ji vî zimanî re ji dil û can xebat kirine. Û gelek jî, ji ziman û rewşenbîriya milletê xwe dizîne û xistine mal jibo zimanê Erebî. Gelek alimên Kurd, Tirk û Faris û ê dimayînan vî karê hanê kirine. Ez dikarim bêjim, lê pir dirêjayî çêdibe. Yek jî zimanê Erebî, zimanekî bi şans û talih e. Di dewrên berê de zimanekî Xwedayî bûye û dawî jî bûye zimanê qir û ziftê. Çawan ku zimanê Îngilîzî bû zimanê zanîst û hûneriyê, zarê Tirkî zarekî jar e. Heta navê rewşenbîrî jî bi Tirkî tûnîne. Pirsê kulturê bi zimanê Fransîzî ye, ne bi Tirkî ye.

Zimanê Fransîzî jî di bin çixçimandina Erebî de maye. Di Farisî û Tirkî de Erebî pir hikûmran e. Lê Kurdî, ne wisa ye. Xwe ji vê lehiyê parastîye. Çiyayên Kurdistanê nehîştîye ku ev ziman rêçikên xwe yên kevin wenda bike. Çi pirsên Erebî ku ketibîne jî, wan pirsan di xwe de çixçimandîye û wan xistiye kirasê xwe.

Zanişmendekî bi navê Micirson di belavokeye xwe ya resmî de ku di sala 1917an de di bajarê Calkutta (Kalkûta) serekbajarê Binxalê de belav kiriye, di derbarê zimanê Kurdî de dîtinên xwe weha diyar dike: "Zimanê ku Kurd pê dipeyîvin, ne şaxeke ji zaravên Farisî yên ku ne li hev û bê âwâ (qaîde-ûsûl) û têklihev û ne şîrîn e û zivir e. Bi vajê vî, zimanê Kurdî zimanekî xweş û zelal û veqetandî ye. Ew jî zimanekî ji zimanên Ariyayî ye. Heta

îro jî di çiyayê Kurdistanê yên asê de pir rind hatiye parastin. Di nav zimanên Rojhilata navîn de tenê ev ziman xwe ji Erebî parastîye. Ji bil hinekî pirsên dînî bi pirsên Erebî re têkeliyên wî nebûye. Û di vî zimanî de gelek pirsên kevin yên Ariyayî, ji meriv re diyar dibin."

(Rûpel: NA 85 ji pirtûka ferhenga Kurdî ku bi zarê Farisî hatiye nivîsandin hatiye girtin û wergerandin. Nivîserê wî Êbeydullah Eyyûbîyan e)

Institut kurde de Paris

Sebebên Berhevkirinê

Jiber ku ez jî kitekê ji vî milletê bê xwedî, stemxwar, perçiqî û mafwendabûyî me û xwîna vî nijadê di min de kelijiyê û niştimana ku ev millet tê de jiye û diji, ango Kurdistana xoşewîst, ku ez jî tê de hatime dinê û xwîn, goşt û hestiyên min ji axa vî ya pîroz û gewre çêbûye û hevdu girtiye û di derguşa wê de min çîçikên dayka xwe ya cefakêş û ji azadiyê bêpar û bi vî derd û kovanî serê xwe danî di axa wê de û kete paxêla wê mejiyê. Û wek însanekî li rûyê dinê diyar bûme û tê de dijîm. Bina li ser vanan daxwaz û vêtek di min de peyda bû ku ez jî ji çanda vî milletî re li gor jêtiş û zanîna xwe bixebitim.

Ser de berhevkirina gotinên mezinan niqîtî dilê min. Lê heyf û mixabin ku zanîna min di derbarê çanda vî zimanî de gelek kêr û kurt bû. Lewra giştêkî xebat û koşa min di zarê biyaniyan de bûye. Bi taybetî di zarê Tâzî (Erebî) de bûye. Dawî jî di zarê Tacik (Tirkî) de û Farisan de bûye. Hindikek jî di zarê Îngilîzî de bûye. Qada xebatê jibo min ev ziman bûne. Jêtiş, hiş û têgehiştin û dem û hengamên min yê xweş û ciwan di van zimanan de bihûrîn û heliyan.

Dawî hişê min hate serê min. Lê çî kar û feyde, çawan ku mezinan gotine; "Heta ku min xwe nas kir, umrê xwe xilas kir." Bi destêkî vala ketim vî karî. Ez mam bi zanîna xwe ya zikmakî. Ger bête pirsîn: Di dem û hengamên xwe de çima te vî karî û ûstûbarê bi cîh neanî? Madem ku tu merivekî xwenda bûyî. Bersiv; ji ne ewlebûna ku ji derve de di giyanê min de hatibû cîdan,

ku zarê Kurdî ne tu zar e, ne zarê xwendin, zanîn û nivîsandinê ye. Ji çend pirtûkan pêştir pirtûk bi vî zarî nehatiye nivîsandin. Û zimanê Erebi zimanekî pîroz û miqedes e. Tiştên ku ne bi zimanê Erebi bê nivîsandin, nizm, kêr û bê rûmet e. Lewra zimanê Erebi zimanekî Xwedayî ye û zimanê bihiştê ye.

Dawî min pêjin bir ku ev gotin ji bin çewt in. Esil û binyad ji wan re tunîne. Û ew gotin ji qeraxê (teref) mijok, kiragirtî û kevneperestan ve bi armanceke nizm hatine çêkirin û bikar anîn. Da ku zimanê Kurdî bidin rakirin.

Piştî van pêjnan min dest pêkir van gotinên giranbiha berhev kir. Di kom, civat, çayxane û mizgeftan de, ji xelk, heval û hogiran min çî seh fikir, pê re di defteroka xwe de dinivîsand. Pirê wan ji hevala xwe ya jînê û ji dêya wê ya dilovan û mihrîvan girtiye. Lê bidaxewe (mixabin) min vê ûstûbarê bi awakî çak û rind û lihevhatî bi cih neaniye.

Jiber ku ez di bajaran de bûm, bi ûstûbareke nanî ve girêdayî bûm û çixçimandina refa mijok jî li ser min pir bû, min nekarî ku herêm, diyar bi diyar bigerim û wan berhev bikim. Bes min vî valatiya ku di xwe de pêjin fikir bi cih anî.

Min têbûr bikin (biborînin)

Spasi

Ez pir spas dikim ji gelê xwe yê Kurd û bi taybetî ji wanên ku bûne alîkar jibona min. Bi taybetî ji hevalê xwe yê paqij M.Î. pir pir spas dikim, ev hevalê xoşewîst di dem û dezgehan de pir jibo min bû alîkar. Û ji hevala xwe ya jînê Besê û ji dayka wê ya pir dilovan û mihrîvan Zulfînaz ku herdu jî ji bil zarê Kurdî zarê biyaniyan nedizanîna, pir spas dikim. Lewra pirê van gotinan ji wê û dayka wê min girtiye û berhev kiriye û ji herdu keçikên xwe Meryem û Nesîbe re jî pir spasan dikim. Lewra ewan jî di nivîsandinê de pir alîkariya min kirine.

Nemaze dema êvaran ku ji ûstûbara xwe divegariyam malê, ewan dibezîn pêşiya min û mizgînî didan min ku min çend gotinên mezinan ji devê dayka xwe girtiye û nivîsandiye. Ev karê wan pir xweşiyeke giyanî û hêviyeke pir bilind dîda min. Pir xweş û fureh dibûm. Ji min ve her wekî hemêzekê kulîlkên şadiyê ji min re pêşkêş dikirin.

Nûredîn Baksî

Silav û bextewarî bo gelê perçiqî

Nik (Not): Hinek gotinên mezinan bihoriya wan heye. Ger ji min re lihev bê, dê wan bihoriyên wan jî berhev bikim û di dawîya vê pirtûkê de binivîsînim.

GOTINÊN MEZINAN

(A)

1. Aysîk e, li xwe bi şîk e.
2. Aqlê sivik, barê giran.
3. Ava binê kayê, deng jê nayê.
4. Av çî qas di golan de bimîne, genî dibe.
5. Ay dilê min, ay dilê min, çî bê serê min, tamam ji destê aqilê min.
6. Agir bikeve dehlê, hişk û ter bi hev re dişewite.
7. Ap û birazî dadike, xal û xarzî radike.
8. Aş çûye, pêy çeççeçokê dikeve.
9. Aş çûye bi avê de, ketiye pêy çeççeçokê.
10. Aş li xiyalek, aşvan li xiyalek.
11. Axa jin û mêrî ji ciyek e.
12. Avê vexwe ji kaniyan, jina bîne ji esliyan.
13. Av di ciyê nizim de diçe.
14. Ava xwestî, naçe hestî.
15. Ava bîr, bi tedbîr.
16. Av dinivî, neyar nanivî.
17. Axa Adarê çêtir e ji giyayê biharê.
18. Adar ne tu bihar e, xox ne tu dar e, keç ne tu war e, jina bimêr ne tu yar e.
19. Adar e dew li dar e, Nîsan e dew li ba hemî kesan e (dew li ba hemî pîsan e).
20. Adar gehijte bîstan, xweş dibin bax û bostan.
21. Adar e bi sibana sar e, nîvro şûnda bihar e.
22. Ahê mûmînekî namîne li zalimekî.
23. Ava li ser berûyê, wêy zava li ser xwesûyê.
24. Ava Zêwikê namûsa Paloniyê (navê du gundan).
25. Ava ku dike guregur jê netirse.

26. Axa got mirtibê ezê rabim û li te xim, mirtibê got, axayê min ezê rûnim.
27. An bike melerize, an meke bilerize.
28. Av dikeve ciyê teng, deng dide.
29. Av rabû, sûkûr belav bû.
30. Avdekurtê xezalê, avdedirêjê betalê.
31. Aşvan zû ke, dev li gu ke.
32. Ava Sapkorê xweş av e, lê ku mîz û guyê Şikranisê (Qemerê) nekeve nave.
33. Axatî birakûjî ye.
34. Adar befrê da gulya dar lê nebû bihar.
35. Agir xweş e, lê xwelî jî jê çê dibe.
36. Ahê bizina kol ji bizina bi sitrû re namîne.
37. Alimek alemek.
38. Axir Şame oxir Şame.
39. Adetên bav û bapîran,kerik xwestirin ji hesîran.

(B)

1. Beq nequire, didire.
2. Bexê nêr jibo kêr.
3. Biçizî neçizî, qencelîz î (Rehê giyakî ye).
4. Bi roj pîrhevok e, bi şev şemamok e.
5. Berxa çê li ber kozê kifş e.
6. Bila meriv mêr be, şev û rojek li dinê be.
7. Bira biratî, bazar beyantî.
8. Bî pîrsê meriv diçe Qudsê.
9. Bi salê here siltan be, mehê here mêvan be, her roj here li nav dest û piyan be (li nav dest û pê san be).
10. Bexê çê jibo kêr e, merê çê jibo hepsê ye.

11. Bila meriv jina mêran be, li ber stêr û pêran be, ne bila jina qelsemêran be, her roj li ser zar û zimanê xelkê be.
12. Bila rê be bila dûr be, bila qîz be bila pîr be, bila por be bila kur be, bila kur be bila gur be, bila avis be bila bi derengî be.
13. Bavê qîzan siltan e.
14. Bext nadim bi text.
15. Bext kela mêra ye.
16. Bûkê ne zare ne ziman, xesûyê ne dîne ne îman.
17. Bixe guhar bixe guhê xwe, nexer girar nexer zikê xwe.
18. Befir dihele çiya dimîne, mêr dimire nav dimîne.
19. Bi xweziyan dest nagehê baqa keziyan.
20. Biratiya wan mina quling û rûvî ye.
21. Bila meriv heft sal di nav nal û bizmarê hespê de be, ne şevêk mêvanê axê be.
22. Bila xwedê yar be, bila dînya neyar be.
23. Bûka metê, li ser agir û pêtê, bûka xaletê her roj sibê li dawetê, bûka apê birine kapê, bûka xalê delaliya malê.
24. Behsa gur e, gur hazir e.
25. Bila piştê meriv li tiştê meriv bî, ne li ê berê xelkê bî.
26. Bistîn kala bixwe mala, nestîn xortê kundir vala.
27. Barê mizhef û kitêban, barkirin darekî edebê di ber re kirin.
28. Berê havînê bavê kadînê, dê hewce bibî Kanûnê.
29. Bira bira ye, bazar cûda ye.
30. Birîndar birînên xwe dizane, dixtor dermanê xwe dizane.
31. Berê giran di cîhê xwe de giran e (baş e).
32. Berê mezin çavê ne lêdanê ye. (Kevirê mezin elametê nelêdanê ye).

33. Bizin bi pê xwe, mî bi pê xwe, her kes û mêvanê emelê xwe.
34. Beza hespê, namûsa siwarê ye.
35. Bizin mir, gir vemir.
36. Bizina kal e, her roj ev hal e.
37. Bizane dew birayê mast e.
38. Bila mêr law be, kirasê meriv caw be.
39. Botan bi mêrê xwe, şervan bi şûrê xwe, Hekarî bi rey û tevbîrê xwe.
40. Bi heft kalan kopalek, bi heft pîran şekalek.
41. Bûka me bi şerm û heya, li rê siwaran dike pêya.
42. Bizin birine berûyê, dest dane teriyê.
43. Bê şêx û pîr neçe dîwana mîr, ku tu nekevî halê feqîr.
44. Ba bê şebaşa bidêr, ba neyê guh bidêr.
45. Bûka bin perde ye, Xwedê dizane qismetê kî ye.
46. Bê pîrekî neçe dîwana mîrekî, dawe ku neyê li te tesîrekî.
47. Bûne xwîn û goşt, ji hev naqetin.
48. Berahiya rê ji şênîya gund e.
49. Bayê Behdînan herin kadînan.
50. Bûye wekî mala mar tê de.
51. Bêdera feqiyê me Kurdan, şerh-mûxnî ye.
52. Befra derê mala xwe paqij ke, paşê dora yê xelkê ye.
53. Bavê min Goyî ye, diya min Torî ye, kes nizane eslê min çiye?
54. Bazar xweş in bi tişt.
55. Bibîne bi zehmet, bixwe bi lezet.
56. Baran ji ewrên reş tê, ken (şahi) ji dilê xweş tê.
57. Bela dê newe, eger bê ser ser û herdu çava be.
58. Bozê rihet, kûmêt jî rihet.
59. Bêder ku bête erdê dê zekat lêkevit.
60. Bertî keviran nerm dike.

61. Bûka heft xesûyan xeniqandî, ji biqebîqa sewîlê ditirse.
62. Ber di cîhê xwe de giran e ku gêr bû sivik dibe.
63. Befra êvarê barana sibê.
64. Berû ji qalikê derket got; gêjû ez ne ji te me.
65. Bibêjin lal e, lê nebêjin tiral e.
66. Bilind nenêre, nizim nekeve.
67. Bihara paşîn bihara mirovan, bihara pêşîn bihara heywanan.
68. Bûk li hespê ye, kes nizane nesîbê kî ye.
69. Bismîllah ji serî de, kes neyê ji derî de.
70. Bizin ne tişt e, lê nêrî li pişt e.
71. Bereketa her tiştî, di destê Xwedê de ye, lê ê dewê di destê diya min de ye.
72. Birayê ne ji dêyo, silavê li ser cadê yo.
73. Bizina kol her tiştî e.
74. Barê deveyê ne bes e, xinge xinga zengila jî serde ye.
75. Bir bir, leya guyê ji min bir.
76. Bi lingekî diçe şerê gundekî.
77. Bejn û balo fetl û fûto, mal û aqil rûq û rûto.
78. Bav harsim (şîre) dixwe, diranên kur disekihin.
79. Bi lavlavê meriv ji ber jina xwe nake der.
80. Bexê nêr li ber du maka ye.
81. Bila bira dilî bi dilî bî, tûrê parsê li milê bî (bila dil bi dil bî, turê parsê li mil bî), şîvê li mal bî, taştê li nav Ûris û Gawir bî.
82. Bi gur re dixwe, bi xwedî re şînê dikişîne.
83. Bîstê Nîsan tîne zivistan, dehê Gulan axir zeman.
84. Bi xwe kirya re derman tune.
85. Bi Mekke bi Mekke ez nayême teke, wextê ku dora wê hat dibê sonda min li ser qiloçê min, nêrî dîsa bide binê poça min.
86. Bi pirs bi pirs heta Suxurs (gundekî nêzîkê Tetwanê).

87. Bi çi ket radibî, bi zimanê xwe ket ranabî.
88. Bavêje pişt, bila bibe tişt.
89. Bûk nemahrem e, li rûyê wê nanêrim.
90. Bi cerra û hîlebazî gelek feqîran dikin tazî.
91. Bi ilm û zanîn, bi zor û zehmet, nahête şûştin heta qiyamet.
92. Bi sala kes nabit mela.

(C)

1. Cêra avê di rêya avê de dişikê.
2. Cewrê gur-êx ji dêla tirek nakeve.
3. Civata cahil tê hebit, kes ranabit bê birîn, garana ker tê hebit, îmkan nabit bê zirîn.
4. Car heye meriv ji dostê diya xwe re dibê bavo.
5. Caran rev ji desthilanînê çêtir e.
6. Cezayê qencyê qencî ye.
7. Cezayê qencî yê xirabî ye.
8. Cîhê yekî li gund nebû, digot cihkê min bibin mala malxweyê.
9. Ciyê dil biêşî bila rû biêşî.
10. Cihelek bavê reşiyê, pîrek bavê xweşiyê.
11. Cil pîr bû, dibe kena deviyar, ku meriv pîr bû, dibe kena beniyar (ciwanan).
12. Cil babet e, nefis hemî kes.
13. Cineta axîretê, îman û qur`an e, ê dinyayê xweşiya jin û mêrî ye.
14. Ciyê yêfîman yan xan e, yan kulxan e.
15. Cil li darê ke, temaşe lê ke.

(Ç)

1. Çavên li deriyan, xwelî li seriyân.
2. Çi qas te dikim quş, tu hey dibî paldim.
3. Çiya çi qas bilind be, rojekê rê pê dikeve.
4. Çiya nagehê çiyân, rû digehê rûyan.
5. Çêlekek rêxoke, garanekê dilewîfîne.
6. Çavê wî dimîne çavê beqê, ne dixwe ne dide xelkê.
7. Çi bihustek çi çar tilî.
8. Çawa sûk e, gaz biçûk e.
9. Çiya da çe, xûyê însanê ji însanê naçe.
10. Çav da çîrtê leylekê got jajî ye.
11. Çi bi bêhn e nanê germ, çi bi quwet e hespê nêr, çi şîrîn e jin û mêr.
12. Çira pêş çavkorahî ye.
13. Çi ray li keçeliya xwe kir, ma dora xelkê.
14. Çi min gira xwe xurand, ma dora keçeliya te.
15. Çinî xwerê min e, kerê xelkê ye.
16. Çi ber li serî bidî, çi serî li ber bidî.
17. Çi qas kurt dikim dirêj dibî, çi qas dişum qirêj dibî.
18. Çi qas gu bê tevdan ewqas bêhn dide.
19. Çi qas kûlîlk hene di biharê, hew qas mesele hene di enwarê.
20. Çi kiriye mêran kiriye.
21. Çêleka meriv avis be, kengî hebe dê bizê.
22. Çi li îş çi li kondîş.
23. Çillê Kanûnê, li mala xwe runê.
24. Çawa şêx û melan e, rihmet li me cahilan e.
25. Çiya hewcê çiyân dibin.
26. Çuka li aziyê (ciyê xil û xarê) çêtir e ji kermêşê beriyê.
27. Çavê koran ji bêhêstiriyê sor e.
28. Çille û çilê dî, mehek û dehê dî, dinya diçe awayî dî.

29. Çi tirsîya me pesîya me.
30. Çira ji binê xwe re ronî nade.
31. Çi roj baran e, ew roj zivistan e.
32. Çi di ûrd e, çi di tûr de.
33. Çûme mala xalê xwe, xalê min da dar û kopalê xwe, berda pêy jin û zarên xwe, heta pişta banê xwe, jibo qeta nanê xwe.
34. Çav dibîne, dil dimîne.
35. Çi qas boz e, ew qas pîroz e.
36. Çivîk digere digere, li ser garîsê xizana datîne.
37. Çilma her kesî li ser lêva wî şirîn e.
38. Çira nîne ku heta sibê pêkeve.
39. Çû Girwat (nave gundekî) hat, ku nehata dê bihata, hat lewra nehat.
40. Çavşîna mû zer, neyarê Xwedê û Pêxember.
41. Çavê reş tene tene, çavê şin bi kerê ve hene.
42. Çi mîrekî aqil belave, pêşî silave paşî kulave.
43. Çiya dibên em tev sî û heşt çiya ne, golikê ber çêlekan dibêjin em jî ga ne, çi qas se û sûtalek ji guhê gundan e, dibên ji esl û cîsnê bavê xwe torin û axa ne.
44. Çiya newal keşezik.
45. Ça saqe, gore liyaqe.

(D)

1. Dew xistin kadik, kodik şun ve nabî.
2. Dewê ceribî, ji mastê neceribî çêtir e.
3. Du zebeş bi destek nayê girtin.
4. De were vê kerê, bide vê borê, bila duv şil nebe.
5. Dostê Kevin hespê zînkirî ye.
6. Derê xwe dadê, gundî û cîranan neke diz.
7. Dîtina çavan qinyata dila ye.

8. Dîza mêra ket, çi şikest çi neşikest.
9. Dinya nas ke, bi lîbas ke.
10. Dîzê got; binê min zêrîn e, heskûyê got, ez nûha ji binê te derketim.
11. Diravê spî jibo roja reş e.
12. Dilê safî dilê sofî diguherîne.
13. Dûr here, dirist vegere.
14. Dinya kî dot, ewî girt û firot.
15. Dilo ne qileqilo, hal heye ji halan xirabtiro.
16. Derdê pezê şivan e, çavê xweyî derman e.
17. Dibêm were em herin cînetê, tu dibêjî qere çarşema serê zîpan e.
18. Dayî dîza çiqas daye, xwarî nîza çiqas xwariye.
19. Derdê min lor e, ne penîrê şor e.
20. Dayê Damayê, ji çi tirsame derdayê, ez çi bikim malê dinyayê.
21. Dinya hemî neyarê kew e, kew jî neyarê kew e.
22. Delalê zû dibe şekalê.
23. Devê kuwara garisê nîne ku tepikekê rêxê lêdim.
24. Di malê de tune ar û dan, navê kevanî Gulxindan.
25. Dûvê seyê heft salan danîn qalibê, gava derxistin ku li nav milane.
26. Dinya daçe xûyê însan ji însan naçe.
27. Dinya bi dor e, ne bi zor e.
28. Dizê malê ji malê be, gayê di kulekê ve dertîne.
29. Dinya warê dînan e.
30. Destê meriv dizane li kûyê meriv dixure.
31. Dinya hat û bat e.
32. Dinya eva ye, her kes bi aqilê xwe şa ye.
33. Dan bi kutanê, cil bi mizdanê, hevîr bi tevdanê.
34. Dinya milk e, mêtêr divê hilke.
35. Destê neyê gestên tê bê ramûsan.
36. Das û werîs, çiya û Bidlîs.

37. Deniz û şîr, bi esil û eşîr.
38. Daxê dide pêşiya wermê.
39. Dil ketiye ray lê nabe.
40. Devê sîr nexwaribe, bêhn jê nayê.
41. Deh mal duwazdeh rispî.
42. Desthilanîn fereca xêrê ye (firûzî ye).
43. Derdê hewiyê jana tiliyê.
44. Destê dayî zayî ye.
45. Destê nanê digihîje Wanê.
46. Derê malê derman e.
47. Dewleta belegewr e, qîz avis bûk stewr e.
48. Dewleta lez û bez, rez û pez.
49. Duwanzdeh ê Adarê av kete darê.
50. Darê xweziya hişk e, ter nabe.
51. Divê bûk bi dilê zavê be.
52. Dan ne ji heyînî ye.
53. Deriyokê dadayî, sêwiyokê vehêsayî.
54. Divê namûsê nedî bi çerxûsê.
55. Diyarî pelendarê tarî.
56. Dew li mirtiban nayê.
57. Dîzika kevin bişkînî bê pêjn e.
58. Daweta duduyan e, gira hemiyane e.
59. Dê bibî dêmarî, bav dibe kavari (bav dibe filleyê kavari).
60. Dê bibe jinbav, bav dibe zirbav.
61. Dê û weleda şer kir, nezana bawer kir.
62. Durnas qîmeta dur dizane.
63. Dextlê çêbî bi bayê, lib zaftir e ji kayê.
64. Destê xwarinê dirêj e.
65. Destê tenê deng jê nayê.
66. Dest serdest heta ezmanê bilind.
67. Destê vala tu jê nayê.
68. Dizane dawet e lê nizane li mala kî ye.

69. Dinê li dinê, mendo li jinê.
70. Dinê li dinê, çavê gur li bizinê.
71. Dinya gulek e, bêhnke û bide hevalê xwe.
72. Diza ji diza dizî, erd û ezman lerizî.
73. Dudu bi hev re rast bin, ê sisiya Xwedê ye.
74. Dermanê xwestinê dan e.
75. Destê rihet li ser zikê birçî ye.
76. Dîwaro ji te re dibêjim, bûkê tu seh ke.
77. Dinya dizivire, demekê gulê ye, demekê şîlanê ye.
78. Dizê bostanan dertên zivistanan.
79. Dirêjiya rê, ji beraya rê kifşe ye.
80. Dest dest dişu, herdu dest difetilin rû dişun.
81. Dinya ji wer e jî namîne.
82. Dîn dînan dibîne, dînê mezin çomaxê xwe datîne.
83. Dinya diheje lê xira nabe.
84. Dinya milk e ji mêran re ku avakin ji xêran re.
85. Dîkê bê wext bang de stûyê wî tê jêkirin.
86. Doma kûfrê heye lê doma zulmê tune.
87. Dawo dilawo, taze min danîne ber xwendinê.
88. Duayê derwişan bi tirê gamêşan.
89. Desthilanîn ji mêran re pîrozî ye.
90. Destek tenê neçe ser xwarinê.
91. Dest ji destî dixwaze.
92. Devê wî ji girarê dişewite, pif dike kefçiyê.
93. Divê meriv hindik bêje, xelk gelek fêmkê.
94. Dilê nazê miraza naxwazê.
95. Dil dilê dihebîne.
96. Dengê defê ji dûr ve xweş e.
97. Dinya sar e, gudo (cilê kevin) yar e dinya germ e, gudo şerm e.
98. Derew li xerîbiyê, forte li kalbûniyê.
99. Dinya milkê rêzê ye.

100. Dibê ê te çend zarok in, dibê heftolek e, dibê ê hewiya te çend heb e, dibê yek e serî gindolek e.
101. Dîza min li kel e xebera min li ber e, ha min got ha min got.
102. Dil e qeyê gilgil e.
103. Dibê mîrîşkê min tune, dawa min bi çîrt e.
104. Dinya bi dor e, geh li jêr e geh li jor e,.
105. Digîrim girîna min nayê, tuka xwe di çavê xwe didim, jîbo arê dinyayê.
106. Dêrendêz e, yan dêz e yan rêz e.
107. Dar nema ba lê ket, cehel nema nav pêket.
108. Dan goştê can.
109. Dizdê xiyaran zimsitanê vejêno (zazakî).
110. Derdê min heft derd e, min şema kişand derket bin erde.
111. Devê min beş e, dilê min reş e.
112. Derew sêwî ye.
113. Derew dijminê Xwedê ye.
114. Destê xebitî li ser zikê têr e.
115. Dilê tirsok sînga gewr nabîne.
116. Dera jina xira nekiriye, hîna ava ye.
117. Diya keçikê ji keça xwe re dibêje: Lawo mêrê te çi mêro, dibê mêrê min hole mêro, çû newala qijdêro, beg û begler rivêro, şurê mamo tîrbêlo.
118. Dest û dev bûne heval, ji karan bûne kefal.
119. Dijûnê bi aqilan çêtir e, ji şîretê bê aqilan.
120. Dudeme ha dudeme, tu çelek ez boxeme, biçî ku li pey te me.
121. Derî ketine terxêç rabune.
122. Dibê ya dibê, were bigre viya, dibê Xwedê hevskê, dibê were viya gez ke.
123. Du parên xîzaniyê nezanî ye.
124. Dil li raberê dil e.

(E)

1. Eşqdilo dengbêj dibin, derddilo pêrbêj dibin.
2. Eyb e ciyê ku serî li wê be, gewde xeber bide.
3. Ez nagihjime te, lê te digihjînim xwe.
4. Ecelê seyê tê, nanê şivanî dixwe.
5. Ecelê nêriyê tê, nanê şivanê dixwe.
6. Eqilê dînan bide ber pehînan.
7. Eqil taca zêrîn e, serê her kesê nine.
8. Evînî nevînî, bimirî nebînî.
9. Elîf û bê, bila bê.
10. Ewir çû Wanê rabine banê.
11. Ewir çû Botan rabine cotan.
12. Ewir çû Botan ga çû cotan.
13. Ez dibêjim eva hirç, tu dibêjî eva rêç.
14. Ev girara ku me dîtî, wê zaf avê hilîne.
15. Ev mirî ne hêja ye vî şînî.
16. Ez zanim tê nan bidî pêxwarin pê re, lê edeb lazime ji kê re?
17. Eslê jinê jin e.
18. Eger pîr nimêj bike, rojê Xwedê zaf in.
19. Em kodika vala li ya tijî bidin.
20. Ew hewş e, lê ne ew rewş e.
21. Evîniya derd diya, dosta re kifş e.
22. Eliyê xemxwar e.
23. Eqil ne ji mezinahî û piçûkî ye.
24. Eqilê kerî ser tê birî.
25. Ewir çûn Bilîs, kew çûne lîs.
26. Ewir çû Behdîna, xelk çûn kadîna.
27. Ew bihara payîz li pêy e, ew insana mirin li pêy e.
28. Emekdaran xwe dane ber dîwaran.
29. Ez dibêjim jaji ye, tu dibêjî spî ye.

30. Ez hêdî diçim bela digihîje min ku zû diçim ez digihîjim belayê.
31. Esil pişt e, zik çî tişt e.
32. Ez dibêm nêr e, tu dibêjî bidoşe.
33. Ewil dexîre, paşê zexîre.
34. Ez dibêm mîm û nûn, ew dibe hoqe û niv rûn.
35. Eger Xwedê hişt hê dibe tişt.
36. Eqil heye li çolê ye.
37. Ez xwe xirab bikim ez ê te ava bikim.
38. Eger zik têr e, xew xêr e, ger zik birçî ye, xew çî ye?
39. Ettahiyatû keçê Fato, çermê hilîn, xweyê hato.
40. Ereb û rez fileh û pez.
41. Eto rebeno zik tijî turik vala, rureşê nav hevala.
42. Eqlê kêr rêya xwar, berê nişanê hevalê xwe dide.
43. Elo dîno.
44. Edetên bav û bapîran, kerik xweştir in ji hesîran.
45. Ez kelê rojek bim û ne mangê hezar sala bim.
46. Ewrê gure gur kir, mêrê tire tir kir jê netirse.
47. Ev cîhan pêkve seranser pêşve wek çerxê diçe.
48. Eger Xwedê daye nifir dua ye, ku Xwedê nedaye dua jî bela ye.

(Ê)

1. Ê neke xeberê mezinan, bi serî ve tê stûrê bizinan.
2. Êşa li hevalê tîra li kendalê.
3. Êl ma hêviya pîrê, pîr nema hêviya êlê.
4. Ê dibêje dike mêr e, ê nabêje dike şêr e, ê ku dibêje nake tîra kerê nêr e.
5. Êzîdî ne cil spî ne cînetî ne, fille ne li pey me ne, misilman man û man.
6. Ê xelkê ser bi ser, ê te sê ser.

7. Êvarê telef e sibê selef e.
8. Ê bûkê pê û pêpal, ê şivanê dar û kopal.

(F)

1. Fêl fêlê Perê, sim simê kerê
2. Feyda gavanan siwarbûna kera ye.
3. Ferxikê jûjûyê, pê wek penbûye, ferxikê kêvroşkê jî pê wek sitrî ye.
4. Ferxikê marê mar e.
5. Feqiyê biçûk kitêp biçûk ez bibim gorî. Feqiyê mezin kitêp mezin, ew bibe gorî min. Feqiyê biçûk kitêp mezin, ne ez gorî wî ne jî ew gorî min.
6. Feqîr du caran bi cilên xwe kêfxweş dibin.
7. Feqîrê jenga mêra ye.
8. Ferxikên yeksalî radîbin hêkên hesînî dikin.
9. Filankes sed cêr av pišta gûhê wî şil nake.
10. Fille û pez, Kurmanc û rez.
11. Fistanê bûkanî, kî baş biqetîne ew baş e.
12. Ferek şime yek xaruk e, çavek kore yek siluk e, bi hezar baban nabim bûke.

(G)

1. Gotin pişo diya te yan jî bavê te?
Got: Naw naw. Ano: Ne ew ne ew.
2. Gotin kerê; jî te re ceşîkek bûye. Got Xwedê xweyê neke, barê min dîsa li pišta min e.
3. Golika malê jî gayê malê natirse.
4. Gava neçîra min tê, guyê tajiyê min tê.
5. Gulê gul bû, baranê lê da şil bû.

6. Genim bû firîk, mele bû şîrîk.
7. Gur bi du pariyan namire.
8. Gotin kerê: were em te bibin cennetê. Got, ma gevzonîk li wê derê heye?
9. Gur daye hevrazê, ji birçîna nikare bimeşe, dibêjin mîrato pir xwariye nikare bimeşe.
10. Gayê qol e, ne mêşan ji xwe diqewirîne, ne jî ji hevalê xwe.
11. Gur li rojên bi mij digere.
12. Giyayê hewşê tehl e.
13. Gotin pişo guyê te derman, xwelî bi ser de kir.
14. Gorên giran deng jê nayê.
15. Gan ganê kera ye, kolan kolana mêra ye.
16. Gotin devê bide avê, got lêva min kol e.
17. Girara ron ji kêmdanê ye.
18. Gaziya pê gurê ye
19. Ger tu nezanî bikire ciwanî.
20. Gur bikeve kerî, kes ji xweyî ne zeximtir e.
21. Gotin feqe tu ji kû yî, got ez ne zewicîme.
22. Gotin koro te çi divê, got du çavên bi ronî.
23. Gotin çi ye tu diçînî, got şin bibe tê bibînî.
24. Gotin bavê te ji birçîna mir, got ma hebû ku wî nexwar.
25. Gotin barê te çi ye, got masî. Gotin navbar, go bila bibe basî.
26. Gotin kerê: Xwedê ceşîkek da te, got navbarê min zêde bû.
27. Gotin deveyê stûyê te çima xwar e? Got ma kû derê min rast e? Ango çiyê min li kar e.
28. Gîsinê çavê xwe de nabînî, şûjinê di çavê xelkê de dibînî.
29. Gotin deveyê xet xet, got min nekiriye qet qet.
30. Gevezan avêtin cehnemê, gotin çi qas sar e.

31. Gundê ji gur da ava be, jîn tê de nabe.
32. Gotin kî dinya xwar, gotin meleqa. Gotin kî bihara xwar, gotin ulaqa.
33. Gotin bavê te kuştin, pirsî siwaran an jî pêyan. Got her kuştin çi siwaran çi pêyan.
34. Gûzekî nede zarokan ku tu bidî, wê didu bixwazin.
35. Guha jêkî kêmo ye, teriyê jêkî quto ye, ku çêkî hero hero ye.
36. Gêdûka mezin şîpanek e.
37. Gayê alşûkan in, ji bêdera xwe re ne, ji ê xelkê re hore hore.
38. Gayê sor e, ji xwe re ne, lê ji xelkê re hore hore.
39. Girar xweş e geh li mala me geh li mala we.
40. Gul xweyî ke gul bêhin ke. Gû xweyî ke û bêhin ke.
41. Gerew ji garanî ye.
42. Gorzoyê belakir e.
43. Gîskim gîskelor, dûv ji bezê xistiye kilor, herdu çirî û kanûn çûn, sibat û adar çi tira min e. Kanûn ji sibatê ker dikim, fer dikim, postê gîskan ser sergioyan wer dikim.
44. Girar e, kevçî dar e.
45. Girtî girtiyê kêl û kefenê, ne girtîyê Hind û Yêmenê.
46. Gazindeya ji kî kim, ji kî bikim şikayet? (Melayê Cizîrî).
47. Gayê qore ji xweyê xwe re ne, ji xelkê re hore hore.
48. Gerandî dirandî.
49. Gotina xweş, buhara dilane.
50. Gundê bê rez, konê bê pez mirovê dibêje ez u ez, hemî ne tu tiştin.
51. Gere mirov hespê xwe, çekê xwe u welatê xwe meke destê xelkê.

52. Go ziyaretê: "Min gelek caran bi drewa bi te swind xwari ye".
Go : "Min gelek caran malate xerab kiriye, lê tu bixwe nizanî".
53. Gavan ber bi male, jina gavan bi şixul u kar e.
54. Giya dibin keviran de namîne.
55. Gulan buke, buk serxwede naxwaze.
56. Golik di binê seviyêde namine.
57. Girara geleskan kizûye.
58. Geriya ku Xwedê qul kiribî helbet dê qismetê wîjî bidiyê
59. Gava heye, ha ne ha ne ,gava tine halê sane.
61. Gotine rovî: "Me tu kirî mîrê mirîşkan". Rovî grî û got: "Ez ji siûda xwe ne bawerim".

(H)

1. Hineka ar e bi nitir e, hineka goz e bi xirxir e.
2. Hesinê bê asaş, ne dibe kêrendî ne dibe das.
3. Hêç bi lêç kenî, lêç jî bi hêç kenî, herdu jî eletewş kenî.
4. Hemî sotin nayên gotin.
5. Hayê bi min hayê hevrişîm hatiye ber livayê, livayê mîrat pir giran di ber nayê.
6. Hosta Necar hosta Necar, dîsa razê wekî her car, xweda yek e delîl hezar.
7. Heya meriv nekeve ranebe meriv nabe meriv.
8. Her teqlek dibe eqlek.
9. Hebûyî li cîhê xwe bi qedir e.
10. Heta meriv li warê taze daneyne ê kevin bîra meriv nakeve.

11. Herê şoxê herê şengê, kember sistê li navtengê, bi meşkê re dikî cengê, kî li te pake ew li te rake, ê li te rake ew li te pak e.
12. Hekîm ew e ku birîn li xwe bibîne.
13. Heya nebî xwelî nabî welî.
14. Heta ciwan bûm min tişteke nekir ku ez pîr bûm min qam nekir (gava pîr bum feyde nekir).
15. Hemam bi tir û fisan germ nabe.
16. Heta rastî bê derew cîhê xwe digire.
17. Heke ker bi nefis e, mistek ceh bes e.
18. Hesp dibeze siwar pesnê xwe dide.
19. Her çi piya ew rija.
20. Heta bîra min li dûvê qot bê, yê te li kêla spî qîma me li hev nayê.
21. Hecî bi hîla nabin hecî.
22. Hekîm ew e ku hekîm wî naş nekin.
23. Hicr û hewale heçî nekit mitale, bila biçîte male.
24. Heta xirav nebe ava nabe.
25. Heta li ser serî negerî hê qedrê lingan nizanî.
26. Heta yek nedî deş nayê şûnê.
27. Heta xwe naskî dê umir xilas kî.
28. Heta neyê sotin, nayê gotin.
29. Hesêba mal li sûkê dernakeve.
30. Heya ji îmanê ye.
31. Hîrç neyarekî serdest e.
32. Hin jin in hin jan in, hin ezîzê dilan in, hin genimê nan in.
33. Hijdê adarê sê melek hatin xwarê. Yekê av bire serê darê, yek jî deng kir li biharê.
34. Hêja te hêlikreşan ser xwe re nedîne.
35. Heçî ne li malekî nizanin halekî.
36. Hêj neçûye govendê xweş direqise.
37. Her teyrek bi refê xwe re difire.

38. Here welatekî nenas, zirta bike bê qiyas.
39. Her bêdînek, jê re bê îmanek lazim e.
40. Hey ji gayê re li bilûrê xe heta dikarî.
41. Hezar dost kê in lê dijminek pir e.
42. Her tişt ji ziravî dişke, lê meriv ji stûrî.
43. Heta hevraz nekeve ber te, qedrê berejêrê nizanî.
44. Hinek dixeniqin, hinek dixeriqin.
45. Hol hatiye ber kaşoyê.
46. Hûn jime re millet ji we re.
47. Heqê bizina kol ji ê bi qiloç re namîne.
48. Heq tê standinê nayê dayînê.
49. Her tişt tişt e, sergîn jî tişt e, lê cehalet ne tişt e.
50. Heft bavê çê îlla şîrê dê.
51. Hê lêlê ye, lolo li paşe.
52. Honekiriya ho neke, ku te ho kir ray lê neke.
53. Hem diz e hem dadiberize.
54. Heta derman bê ji Bexdayê, mar pêvedayî dimire.
55. Heçî wey min tazî, ew tê min dixwazî.
56. Hesp bi tewlek baş, mêr bi xeberek baş tê girêdan.
57. Hespê beza diçe li qeza.
58. Heyfa mêra ku herin, qelsemêr bimînin.
59. Here ba wî kesî ku te bigirîne, neçe ba wî kesî ku te bikenîne.
60. Her dar li ser rehê xwe şîn dibe.
61. Here were meaşê te deh pere.
62. Here Cizîra Botan bibîne zerî û esmeran.
63. Here Cizîra Botan bibîne gewr û rindan.
64. Hesp tune zîn hazir kiriye.
65. Hesp tune afir çê dîke.
66. Hindik bixwe da ku gelek bixwî.
67. Heger ez bibim bûk ez dizanim doxînî li kû girê didim.
68. Hawara vir şahiya dilê xortan e.

69. Hindî bigerin çerx û felek, risqê bê çek nabît gelek.
70. Her kî guhê xwe nede zana, dê lê peyda be rojê poşmana.
71. Her kezîzerek simêlsorek li ber e.
72. Hinekan dar birî hinekan cew birî, hinekan hêviya xwe ji Xwedê nebirî.
73. Hevaltiya bi zaran re bi zehmet e.
74. Her dêlek hatiye ji êlek.
75. Heta tu ji hava çûyî seytiyê, ez ji wê de fetilîm hatim.
76. Hespê kur e heft afir e.
77. Herê herê hebû heft birayê Perê, Perê şandin pey kerê.
78. Heta erebe newergere rê rast nabe.
79. Hem dar e hem debar e.
80. Here welatê keran bîne peran.
81. Her tişt fera nêr, ser a mê ye.
Mijûlî fera mê ser a nêr e.
82. Ha liha xîtik, ha liha mendik, dest da gunik (binê tûrê) spî sinik.
83. Hesinan da hesinê simtiraş, mêran da jî mêrê ku nedide pêş nedide paş.
84. Hezar gotin wek çêkirinek nabin.
85. Hêviya yarê bî, dimînî bê weled.
86. Hêviya yarê ma, ma bê diran.
87. Hevalê firehiyê zaf in, yên tengiyê kê m in.
88. Her karê bêje, her karê neke.
89. Her kes mêvanê emelê xwe ye.
90. Her kes qasê emelê xwe ye.
91. Heke ba hat bidêre, heke nehat guh bidêre.
92. Hingî dinya xira dibe, mala Tirco ava dibe.
93. Hindî mal e, mamô xal e.
94. Hindek bêkesiye hindek bê nefsiye.
95. Heftikên nîsanê gîtek ji gîtên zivistanê.

96. Hevdeyê Adarê melek radibe serê darê, qîr dike li biharê.
97. Heçî li hespê hevalan siware, herî pêyaye.
98. Heyfa ciwaniyê pîrî li pêye, heyfa heyverojê şeva reş li pêye.
99. Heta tu cehenemê nabînî, cennet bi te xweş nabe.
100. Hewara pê gurêye, rêya çunê nehatinêye.
101. Heya serî sax dimîne, çav ecêban dibîne.
102. Heta min xwe naskir, malê xwe xelaskir.
103. Heta min golikek xiste ga, hestiyê min jî bu ka.
104. Hezar qeda bê li wê pîrê ku wî cihantîyê neyne wî bîrê.

(Î)

1. Îro ronî ye sibê tarî.
2. Îşê min biçe serî, bila biçe zeviya ber derî.
3. Îro Şivan şêr e, sibê bê xêr e.
4. Înça wî înça filla ne.

(J)

1. Ji qehpan ve hemî qehp in, ji qencan ve hemî qenc in.
2. Ji bona çavekî dihebînim çiyayekî.
3. Ji weliyan xwelî, ji xweliyan welî.
4. Ji guravê ketine çiravê.
5. Ji keriyê gur ez mame kavirê gir.
6. Ji te hereket ji Xwedê bereket.
7. Ji melayê meşûr weris xwestin, got: "Min garis li serê daye tavê".
8. Ji serê qijikê qelî çênabe.

9. Ji vê dûayê re nabêjim amîn.
10. Ji hev qetîne, tu mezinayî bike.
11. Ji gayê re pûfke bilûrê heta dikarî.
12. Jin darê şikestî ye.
13. Jin û mêr tevr û bêr.
14. Jina belaş, xulamê bê meaş, zeviya kaş, bi kêrê xweyê xwe nayên.
15. Ji kerê meztir qantir e.
16. Ji te bin, ji min binzik.
17. Ji biçûkan xeta ji mezinan efû.
18. Jehrî ji maran xilas nabe.
19. Ji darê nebûya destiye bivir, ferqa wê çibû ji kevir.
20. Jina rezîl ne tê kuştin ne tê berdan.
21. Jêra jêra ez wî nastînim, jora jora ew min nastîne.
22. Ji xwe re kul e, ji xelkê re gul e.
23. Ji kerba dide derba.
24. Ji derda rû berda.
25. Jin kele ye , mêr girtî ye.
26. Jina rind, zeviya ber gund, bela ye.
27. Jiber şirikê çû ber gurikê.
28. Ji qelsemêra we ye, laşê xweşmêran naêşe.
29. Jina bîne ji keran re, da ker bigehên rêyan re.
30. Ji piran pîr diçin, ji hindikan hindik.
31. Ji xwe gul bû, baranê lêda şil bû.
32. Ji dê û bava, hezar ava.
33. Jîr di zîqaqan de wenda nabin.
34. Ji şîrî heta pîrî.
35. Jina sipehî bela ye.
36. Ji mele bawer nakî, ji zirazira kerê bawer dikî.
37. Ji bangêrê meztir ser çokê de nayê.
38. Ji kîsê kurim xweş dibirim.
39. Jiber lehiyê revand avête ber lêmiştê.
40. Ji dêla tirek cewrê gurêx nakeve.

41. Ji xiraban re xew çêtir e.
42. Jina çavlîder mêrê xwelîser,
mêrê çavlîder jina xwelîser.
43. Ji roviyê zexeltir nine, li sûkan ji eyarê wî bêtir nine.
44. Ji gura birçîtir ji mara tazîtir.
45. Ji neçarî, meriv dixwe nan û karî.
46. Ji hirçek du eyar dernayê.
47. Ji şerê re xal û xwarzî, ji şorbê re ap û birazî.
48. Ji cotê re ne, ji mozê re bav û bira ye.
49. Jin ji bêjing gerinê kifşe dibe.
50. Ji darê şîn dibe (radibe) hezar şax.
51. Jibo kezebê meriv xwe davêje xezebê.
52. Ji seyê re çarix çenekin, dê çarixê xwe bixwe.

(K)

1. Kî kêvrojka nêr û mê ji hev nas dike, merivê zalim e.
2. Kî tir kir, sêwiyê bê dê û be bav kir.
3. Ker bikeve deve dikare barê wê hilde, deve bikeve
ker nikare barê wê hilde.
4. Kor ew e, di bêjingê de nebîne.
5. Kera me bi xatîk e.
6. Kevirê niç niçê, ji devê gurê dertê, dikeve devê hirçê.
7. Kezeb bi stûyê gurê ve kirine.
8. Kî lezandiye, ne bezandî ye.
9. Ker hûr e, bor kûr e.
10. Ku mirov here gundekî ku tev yekçav bin, divê meriv
jî çavekî xwe benîşt pêve bike.
11. Kero wekî hero.
12. Ker çi zane zehferan çi ye.
13. Kî bilez birî, du car dirî.
14. Kurê pîs mala mêran xirav dike.

15. Karçîn ketiye, poça wê hevraz bûye.
16. Ku heram bixwim, beran dixwim.
17. Kela dîzê da derxûnê.
18. Ku go piç, hûn li ber dibin qûç.
19. Koçer ku bavê wan îxtiyar dibe, dişeyînin ber
berxikan.
20. Kesadî dike fesadî.
21. Kulê xwe da serê milê, qencan dibe xiraban dihêle.
22. Kes nabêje dewê min tirş e.
23. Ka û kadîn, sak û golik xilas dike.
24. Kortanê kerê decal e.
25. Kî ne millet e ew illet e.
26. Kî qazî ye ji xwe razî ye.
27. Kî bi wefa ye, ew bav û bira ye.
28. Kî kes e, jê re herfekî bes e.
29. Kurmê darê ji darê nebe, zewala darê tune.
30. Kî dûr e ew nûr e.
31. Kî kevçî bi dest e, dinya jê re bi qest e.
32. Kevirê mezin elametê nelêdanê ye.
33. Koremişk çi qas xwelî rake bi serê xwe de dike.
34. Kes jibo xêrê naçe dêrê, ku biçe dêrê wê birî dêrê.
35. Konê reş bênamûsiyê navê.
36. Kena bê aran, tê ji qulê dîwaran.
37. Kena ber girînê ye.
38. Kî kir kî nekir, sêwiyê bê dê û bê bav kir.
39. Kevirê giran di cîhe xwe de baş e.
40. Kurmancê têrxwarî, filleyê meyxxwarî.
41. Kesê cêra çêke, dikare çemila pêve bike.
42. Kî dîz çêke, çembil jî pê ve datîne.
43. Kêvroşk ji çîyan natirse.
44. Ku te girt bernede, eger te berda pey nekeve.
45. Kûsî jî xwe ji heywanê kûvî hesab dike.

46. Kesê min ê nekes nebîte kes, eger bibîte kes eman ji dest.
47. Kero nemir bihar tê, pîrê nemir pincar tê.
48. Ku min got tajî ye, ji xwe tu dê bêjî spî ye.
49. Ker tune kortan çêdike.
50. Kaniya ku te jê av vexwar, kevir nevêjîyê.
51. Kar û şixûlê mala xwe be, şîrînê dilê xelkê be.
52. Ker dixebite hesp jî dixwe.
53. Keçelo navê min li navê te, kûma min li serê te.
54. Kesê deveyan bikire, lazim e serderî bilind bike.
55. Kesê xweyê deveyan be, dê serdera wî bilind be.
56. Kî dixwe sawarê, bila ew biçê hewarê.
57. Kew li pelendarê ket, ne pelendar li kewê ket.
58. Ka çûn kadînê, kêç çûn hêlînê.
59. Kerê xwestê nawestê.
60. Kero nemire himar e, heta hêşîn bibî qîwar e.
61. Kesê nexwestî naçît dawetê.
62. Keş e hicet xweş e.
63. Kesê kes e carek bes e.
64. Kula te ne lor e, kula te penîrê şor e.
65. Keda helal be, meriv jê naqete.
66. Kew difirin hêlexweş dibin.
67. Kanûn û tû.
68. Ker û zehferan.
69. Kayê rizî bela serê kerê ye.
70. Keçel helew bi perê xwe dixwe.
71. Kaniya şênê ye, gava lazim dibe nayê, gava lazim nabe tê.
72. Kalam nema min negot, gotin nema min negot, kî dinyayê dot, ê ku stand ê ku firot.
73. Kur ji bavê bilindtir e.
74. Kesê xwendî her emîr e, nexwendî wek pîvaz û sîr e.
75. Kor çilo li Xwedê dinêre, Xwedê jî wîlo lê dinêre.

76. Kêf li Ereban nayê.
77. Kurmanc ku têr dixwe, yan jinekê tîne yan jî mêrekî dikûje...
78. Kûçîk kûçîkê me ye, lê li derê xelkê direwe.
79. Kûçîkê pîs gur tîne pez.
80. Kûsî hêkê xwe dike bin axê û dibêje, ku ji Xwedê re lazim be wê çêlikan derêxe.
81. Ku kela şorbê çû, bihayê Hesku pere nake.
82. Ker kete heriyê, Xwedê wê rahije teriyê.
83. Kûmê bêxîretiyê nedin serê xwe.
84. Kêlê me saz, haydê xilas.
85. Kerê wan tera bibe digîrîn, ku meriv tera bibe dikenin.
86. Ker jî ku kere, carek kete heriye, cara duyan, lingê xwe vediguhêse.
87. Keçelo pinî pinî, amelê serê min î.
88. Karê xelkê, rihetiya canim, xera kirina malim e.
89. Kayê kevin nede bayê.
90. Kurmê şîrî heta pîrî.
91. Kevir bileqe, hew cî digire.
92. Karçîna xenoqe ye.

(L)

1. Lêv ji diranê pêştir e.
2. Li ber defa bédeng direqise.
3. Li dewsa şêra seyê sor danîne.
4. Lawînî kew e, wey bifire êdî hew tê dest.
5. Lawîkê hingolê, nabe cindiyê Stenbolê.
6. Li xwekirîya derman tunîne.
7. Li kû xwar e, li wê war e.
8. Lingê xwe li gora bêrika xwe dirêj ke.

9. Lew me keziya biriye, da ku kes xwe pê negire.
10. Lêhatin, ji jêhatinê çêtir e.
11. Li ba bê aran tirek dudu sisê.

(M)

1. Mêrê jinekê rûkî reş e, lê yê duya herdu reş e.
2. Mêranî dûvê masiyê ye, her kes nikare bigire.
3. Min diz berdaye, ew min bernade.
4. Meriv li çi bigere, tê digere.
5. Mêrê kotî zor e, min go qîr e te go şîr e.
6. Mêrê xirab kul û derd e, jina xirab bigre berde.
7. Mêran mêr kûşt, Cibran ûr û rovî dişuşt.
8. Merivê ciwan guneh bike ar e, merivê îxtiyar bike zaf ar e.
9. Mî u bizin bi dizî digerin, bi eşkere dizên.
10. Mesela çeleka zer e, zaf şîr dide, paşê pehîn lê dide.
11. Meriv fêm neke, kîn nake.
12. Min kê girte mirêba, li min bû ta û têba.
13. Mala dudîla, di beriya zaliman de xirab dibe.
14. Merivê xweyê neyar kewa pehtî ye li ser nanê ye, ha meriv xwar ha meriv xwar.
15. Min rojî girt te îd kir.
16. Mirî mir şîrîn dibe, ga mir bi nav dibe.
17. Mî gişt e, beran li pişt e.
18. Malê dinê, hem dînbir e hem dilbir e.
19. Mêrik got fistanê te çi ye, jinikê got, fistanê min tefte, qewlê min û diya te bîr hefte (hêla Bilîsê)
20. Malê dinê sitûrê mêran e.
21. Mêrê girt êlê girt, mêrê berda êlê berda.
22. Meriv ker be jî, bila kerekî baş be.
23. Mala pîrê gora pîrê.

24. Merivê bîndest tim rezîl e.
25. Merivê mirî dikin tirên jibîrî.
26. Min ji vê ewrê ne bawer e.
27. Merivê ku biçê masiyan, dê laşê wî şil bibe.
28. Mîrê min heliz behî (hişk bu).
29. Mala Erebê pîr e, ne arvan ne hevîr e.
30. Meriv pîvaz nexwe, bîhn ji devê meriv nayê.
31. Mişk xweliyê dikole li serê xwe dike.
32. Mirî ne mel-ûn be, gor lê teng nabe.
33. Merşika yekê bi avê ve çû,
go bila xêra dê û bavê min be.
34. Mizgînî dane kerê, gotin ceşîkek ji te re bû, got ê
min kêmbû barê min zêde bû.
35. Mî û bizin bi dizî gon dixwin, bi eşkere dizên.
36. Mebêje Ereban merheba, wê rûne ser kurk û eba.
37. Malxoyê me om e, xwelî li serê me.
38. Meriv çi biçîne ewê hiltîne.
39. Mêş biketa nava dewê dimêt paşê davêt.
40. Meriv bidiyê û bireve.
41. Malê hêvşandî, xwerê zalima ye.
42. Mêr lehiye jin stêrî ye (sikûr e).
43. Mirîşk radîze di xewna xwe de kut dibîne.
44. Mala dîzan de heroj dawet e.
45. Mîr bi xulam, xulam bi olam.
46. Mîminê were kundiran.
47. Mêran çi kir, jê re dimîne.
48. Me pez nediyê li rêz, qêy me pişkul jî
nediyê li parêz.
49. Mala bekîr e, yek ji yekê setîr e.
50. Mêrê du jinan tim rezîl e.
51. Mamê hêris, çi li hêr e çi li ber gêris.
52. Manêre bikeve binê kevîrê dê rake.
53. Mal ji canê re, can ji gorê re.

54. Mala pîrê xweştir e, ji ya mîrê Cizîrê.
55. Mast sed caran mast.
56. Mala zêra xirab dibe, yê mêran na.
57. Misqalekî goşt, hezar eyban vedişêre.
58. Mirina tebayî çêtir e ji jîna cûdayî.
59. Mirovê mezin bibit ker tu lê sîwar bî lingê xwe lê nehejîne.
60. Mezinan biçûkan re ti nehîştiye.
61. Mezin dibehîsin biçûk lew dihewîsin.
62. Margestî ji xwuşka mar ditirse.
63. Mekîn mekanaan xweş dikin.
64. Me bûkê anî lez û bez, sivika mal dîsa bûm ez.
65. Mêvan bi risqê xwe ve tê.
66. Miminê were tuyên belek (şêmi).
67. Mêr cûh e jin qefo ye.
68. Merivê bê esil, mina darê bê fesil.
69. Mamo maşo kêfa xwe kir, ecemê av li xwe kir.
70. Melayê ku bi tirekê bê, bi firekê diçê.
71. Mêrê kotî girêya gûyê ye, ne bi dev vedibe ne bi diran.
72. Mizgefta erbo dîwane xweş dîwan e, behsa wan behsa keran e, kerê mezin melayê wan e, nizanin ku feqiyê Teyran li wir mêvan e.
73. Mêr ketine kuwarê, jin beziyan hawarê.
74. Mêrikê aşitî meşka dîmsa wî rijiya, got bila xêra miriya be.
75. Meriv nebîne zehmet naxwe nîmet.
76. Mala min û te danî, bayê lêda hilanî, ez jê derketim yekê bayebanî.
77. Margestî ji werisê ditirse.
78. Mezin li mala, biçûk li bana.
79. Mêrê bêbext pîr be, ser de derbas nebe.
80. Mêrê bi lepê xwe ye.

81. Mirin heye veger tune ye.
82. Mirina hespê ji cehê be.
83. Merivê nezan, dike xeberê erzan.
84. Mişk nikare biçe kunê, sexevêl bi poça xwe ve girê dide.
85. Moz çu ba mîroyê zewade jê xwest, mîro gotê, "gava min li ber tavê dest û lingan disot, te jî li ber guhê lawikan lawjen digot".
86. Mîrok û mêş, mirtib û derwêş, kes nikare wan ji derê xwe bixe der.
87. Marê ji pungê hez nekir, çû li derê qula wê şîn bû.
88. Mamê Remezan, mamê Remezan, ga û golikan bi derdan, ew maye ev xeberdan.
89. Mîrîşkê hêk kir, ji xwe re heval çêkir.
90. Mal birçî ye, kevanî qereçî ye.
91. Mal têr e, kevanî şêr e.
92. Merivê bê kêr e, bê xêr e.
93. Mele bibir wekê bivir, mele got, "gayê riye bi destiyê bivir".
94. Mî bi piyê xwe bizin bi piyê xwe, her kes mêvanê emelê xwe.
95. Meriv bi kumê (şûjinê) naçe ser dirêjê.
96. Malê têr ke, paşê xêr ke.
97. Meriv eqil ji bê eqilan hîn dibe.
98. Mar çi qas çivan bidin xwe, bi rastî dikevin qula xwe.
99. Mişewşî heta hewşî, gebol heta Stenbol.
100. Meriv têr e, xew jê re xêr e.
101. Masurlêker bune tewin çêker.
102. Mîrov kuştîyê şêra be, ne girtiyê ruviya.
103. Mu bi mu, ruyek çêdibe.
104. Min qîz anî xelkê bir, min kur anî hikmetê bir, min genim çand sirê bir, min garis çand tavê bir.

105. Mihaciro tējikê guro, bi şev di xingilo bi roj di temiro.
106. Min xelkê hînkir govendê, êdî kesî destê min negirt.
107. Mêr çem e, jin gol e.
108. Mêvanê yekî, mêvanê gundekî.
109. Mêşa gu li gu datîne.
110. Mala mêran kaniya zêran.
111. Meriv ketîbe her tişt neyare, mu jî bi meriv heta dikare.
112. Ma ne xwîne? Ha ji dest, ha zend.
113. Mêvan ji mêvanê, xwediyê malê ji herduya acize.
114. Mirîşk nekilê xwe di avê de dike, berê xwe bi Xwedê ve dide.
115. Meriv xwe bi sîrekê di te bide, xwe bi pîvazekî ji te xilas nake.
116. Meriv dibêje qey te kotan kişandiye.

(N)

1. Ne ew e, ne ew e, keşk birayê dew e.
2. Nava destê reş nebînî, tama devê xweş nabînî.
3. Ne dixwim motê (dimiz) te, ne dikim cotê te.
4. Navbêna gur û miyê, deviyekî maye.
5. Nan û pîvaz heye, nexweşî çavreşî ye.
6. Nanê xwe dixwim bi avê, hîlnadim mineta mala bavê.
7. Ne gayî ye ne zayî ye, xwariye beredayî ye.
8. Ne bist û ne kebab.
9. Nîv mele dîn dibin, nîv hekîm can dibin.
10. Ne di circiqînî ne dertînî.
11. Ne adar e ne nîsan e, roja Feqiyê Teyran e.
12. Ne ji neha ye, ne ji deha ye.

13. Nezanî rihetiya canî.
14. Nezan e neguhdêr e, ji hakimê zalim xiravtir e.
15. Ne tengî dom dike ne firehî.
16. Ne tir e deng jê bê, ne fis e bêhn jê bê.
17. Nakenî serê zêr, dikenî zikê têr.
18. Nan hebe dew tune, dew hebe nan tune, herdu hebin ez ne li mal im.
19. Nimêja du wext, wek şahê ser text.
20. Nîşanê bafrînê bane, nîşanê mirinê tan e, nîşanê evînê dan e.
21. Nahêle se li pey xweyiyê xwe biçe.
22. Neyarê bi aqil, çêtir e ji dostê kêmaqil.
23. Ne xema min e ne dema min e, qirçe qirça benîştê min e.
24. Nanê xwe dixwe bi avê mineta kesî navê.
25. Nav navê gurê, namûs namûsa hirçê.
26. Nok çû bajêr bû leblebî.
27. Nan nîne kelapaçe dixwaze.
28. Ne li rengê titûnê binêre, ne jî yê mêra.
29. Ne şîrîn be ku xelk te bixwin, ne jî tal be qu xelk te bavêjin.
30. Navê revê pir giran e.
31. Navê revê ne xirab e.
32. Ne xêr li xiyarê ne bereket li mişarê.
33. Nexe girar nexê zikê xwe, bike guhar bixê guhê xwe.
34. Ne bi malê pir ne bi gerdena sitûr, malê pir zû xilas dibe gerdena sitûr zû zirav dibe.
35. Nanê mêra bi mêra bi ker e (bi deyn e).
36. Niyeta dilê meriv bela serê meriv e.
37. Ne golikê bimije ne xesuyê bikûje.
38. Navê gund namûsa gund e.
39. Nan bide nanpêjan, bila nivî bixwe û nivî jî bipêje.
40. Nan bide nanpêjan bila nanek zêde be.

41. Neyarê bavan nabe dostê lawan.
42. Neyar neyar e, çi rast e çi xwar e.
43. Nekene bi kesan tê serê nefsan, neyê serê nefsan tê bê serê pisê pisan.
44. Navê aqlê gelo ye.
45. Ne mal çêke ji zarê çê re ne jî yê xirab re.
46. Ne şeytan dibînim ne jî qul-huwe-llah dixwînim.
47. Neyartî nerme nerm, dawet germ e germ.
48. Nanê mele çavê mîro, piyê maran qelbê safî, kurikê sofî min li dinya qet nedî.
49. Ne sîre ne pîvaz e, qeda bê li dermanê germ e.
50. Ne dixwim savarê ne diçim hawarê

(P)

1. Pîrê bawer nedikir mêrke, gava mêr kir dawa mer û heştika kir.
2. Pîrê got keça xwe: "Keça min neçe nav kura."
Keçik gotê: "Yadê ewa tu dibêjî qediyaye."
3. Piştî baranê ga cil dike.
4. Peza bi tenê, gura xwariye.
5. Paşiya pehniya wî vir da be.
6. Pif dike ezmanan.
7. Pirêz di destan de ba dide.
8. Pez rez e, ku hat rez e, ku çû kul û merez e.
9. Pîvaz pîvaz e, çi sor e çi sipî ye.
10. Pîra du qota, li xwe dike du pota.
11. Pîrgotin ji Quranê re lazim e
12. Pîrsa xesuyê pîfa seviyê.
13. Pîra sibatê rabû libatê.
14. Piçik piçik dibe kuçik.
15. Piştî xan jin û makê xan.

16. Payîzan kurtan e biharan xiftan e.
17. Pîr li hêviya koçê sekinî, koç li hêviya pîrê nesekinî.
18. Pîrç e pîrç e heta dibe mînanê hirç e.
19. Pîrê fedî kir bihata govendê, gava ket govendê êdî govend berneda.
20. Pîra Şamê, tebayê amê.
21. Pêlên mayî, ji ên bihûrî bêtir in.
22. Piştî Hesênê bûbî, mêr li min heram û gu bî.

(Q)

1. Qedre gulê çi zane, kerbeş divê kerê reş.
2. Qencî qencî tine.
3. Qismetê pisîkan, li kevaniya xirab e.
4. Qûbê spî gişt ne ziyaret in.
5. Qencî bike li mala xwe nemire.
6. Qazî rabû mûftî şabû.
7. Qêy ji te xwîn tê ji min av tê.
8. Qêy ga dike ga dixwe.
9. Qêy vir kavirê kî ne.
10. Qazî zarokên xwe xeniqandîye.
11. Qabîliyet ku nebe, hikmetê ûstat dê çi be.
12. Qesa neyê ser kesa, tê ser vêrisa.
13. Qêy mirine ray lê nabe.
14. Qurbana dewî nabî, qatix dixwazî.
15. Qismet ne li xebatê ye, ecel ne li ihtiyatê ye.
16. Ququ cucik li min zêde bû, nekilê min bi çenc nebû.
17. Qeda bikewe li sakê, ku neçe li makê.
18. Qijik penîr didize, jûjû maran dikûje.
19. Qêy derew gîsk û kavir e.
20. Qêy teberik e, zik belik e.
21. Qêy têrxwarin e, pêxwarin e.

22. Qirêjiya mejû teniya bi don e, wek qir û zift e hişk e ne ron e, bi ilm û zanîn, bi zor u zehmet, nahête şuştin heta qiyamet.
23. Qêy berû bizine.

(R)

1. Roja xweş ji sibe ve kifş e.
2. Rûyê reş ne hewcê tenî ye.
3. Razî nebû barxanî, poçik kete terxanî.
4. Rûyê xwestinê alek reş e, yê nedanê du al reş e.
5. Rûviyekî gerandî, çêtir e ji şêrekî razandî.
6. Ranazêm li ciyê kaş nabînim xewna fahş.
7. Rê dibe bost dijmin nabe dost.
8. Roja qiyametê rûyê reş û sipî dê kifşe bibe.
9. Rast be, ji Xwedê xilas be.
10. Rastî tal e.
11. Roja teng, yan mêrekî çê, yan çiyakî asê.
12. Rûvî nediçû qulê hejik bi poçika xwe ve kir.
13. Rihmet li gora kefendizê berê.
14. Rasto dirîsto xwero şikesto.
15. Rojî negirim, paşîv jî nexwim bibime filleh.
16. Rasta zewal nîne, qelba (bêbexta) mekan nîne.
17. Rih dê bi rastî derkeve.
18. Rastî şûrê Xwedê ye.
19. Reva kidikê (pîsikê) kadîn e.
20. Rûne di eyarê seyê de ye, nayê xwarin.
21. Rê li ber e, kî neçe ew ker e.
22. Rojekê nêre kertî, bi sed rojê makartî.
23. Rêwî tîr e tîrê tîrşa.
24. Rûyê te bû hirî tu nebû merî.

25. Rûniştin dê û bav e, ji kesî re nabê rabe, gava ku rabe malxirab e.
26. Rê li kû, rehwan li kû.
27. Rasto be pir zû be.
28. Roj çû sûkê xwezî bi bûkê, roj çû ava xwezî bi zava.
29. Roja şilî zuwa me, bi dewê çêlan (çêlekan) riza me.
30. Rê rêya mirinê be jî, tu her tim li pêş be.
31. Rovikî berdayî, çêtir e ji şêrekî girêdayî.
32. Ruyê min tine, simêlê min pere nake.
33. Remo warê guhazt, tajiyan devê kup alast, Remo bu koçerê rast.
34. Rindikan bibînin li ber medikan.

(S)

1. Serê kêrê di zikê zebeşê.
2. Silav li miyan e ne li rûyan e
3. Serê neêşandî çi hewce kefi ye.
4. Se bi meriv re bikeve têrê, meriv diherime, meriv jî bi se re bikeve têrê, dîsa meriv diherime.
5. Serê du beranan naçe dîzekê.
6. Serê du beranan di beroşekê de nayê kelandin.
7. Serê bê teqerek jixwe kundir e.
8. Sim simayîl.
9. Serayiya heft deling.
10. Ser sûr ûrûsê pûr.
11. Serê keçelan di bin kûm de baş e.
12. Serê keçel xweş e, ku di bin kûm de be.
13. Ser bide sir nede.
14. Se kû se ye naçe jina.
15. Sivikê êvara, nagihê hêsara.

16. Sê kes hene li dinê, ewên ser hesabê mirinê, ê mî dide bi bizinê, ê bişev digere bi tenê, ewê diçe ser hesabê jinê.
17. Sibat mêrekî çê ye, roja ewil sisê ye.
18. Siya darê dê û bav e, kesek nabê rabe, ku mirov rabû malxirab e.
19. Sêzdehê Hezîran e, roj vegeriyan e.
20. Serê çilane roj vegeran e, nan bûne teqal, kevanî bûne beqal.
21. Sar e serma ye, potik bav û bira ye.
22. Sekn û hêsayî bi aborî ye,
qir u qêrîn tev jibona wî ye.
23. Ser hêlûyê, mal bi gûyê.
24. Se bi kişkişê nêçîr nagire.
25. Stûn stûn fereca xêrê ye.
26. Sed barê xem, du qirûş deyn eda nakin.
27. Sor û zer, wî kul kire der.
28. Sar e gur har e.
29. Stûrê tûj ji ewil ve tûj e.
30. Sê tişt xweş in sarî: tirşik, mehîr û karî.
31. Sê gedik hene li dinê: Yê li rê biçê tenê, yê li evraza vexwe tifûnê, yê rex mala bavê xwe yê jinê.
32. Sê tişt hene bi lezet: pez, rez û hurmet.
33. Serê ber minet e, biçê nav ziyaret e.
34. Serê xêrê şîrîn e.
35. Serek ne eskerek.
36. Sofiyê cahil sed sal emel bike ji dil û mil, wextê wê bê wek seyê dûvê xwe dide mil.
37. Ser mezin ling biçûk xwezî mala tu tê de bibî bûk,
ser biçûk ling mezin, ne xwezî mala tu tê de bibî jin.
38. Sêzdehê Hezîranê berê xwe da çille û kanûnê, ewan jî berê xwe dan zivistanê.
39. Sêzdehê kanûnê, berê xwe da sosin û beybûnê.

40. Silav li sifra hazir e.
41. Ser hebin hingî te bivê kûm.
42. Sûk tijî qûmaş e, lê mele bê şaş e.
43. Sed mêr kerwanek, du jin dîwanek.
44. Singê du çiqil di erdê re naçe.
45. Sing erdê re naçe lê miqûh xweş dibe.
46. Se goştê seyê naxwe.
47. Serê ku heft serî jê neêşê ji çi re ye.
48. Seyê re se û niv divê.
49. Ser de xuftan bin de kurtan.
50. Serê karan e bîst û çaran e.
51. Siwarê ereba kî dibe, kilama wî dibêje.
52. Sê payê xîzanê tê ji nezanî.
53. Sibat e gur hate.
54. Se li siya erebê dikeve, dibêje siya poça min e.
55. Sibat dimîne jina jinebî, geh digirî geh dikene.
56. Siwarê devrûtê (hesp) sibê diçî êvarê zû tê.
57. Seqa bi qasî heqa.
58. Serî jêkin kemo ye, poçik jêkin qolo ye.
59. Sed kar bi lingê xwe bike, ne yek bi zimanê xwe bike.
60. Sofî siloqî, ez feqî me tu çi zirzop î?
61. Seriyê bi rû nayê kirin.
62. Sed xeber bi xeberekê disekine.
63. Serekê me welo ye, xwarina me çilo ye?
64. Sertîra tevrê, di bin rehê gonyê de ye.
65. Sibat e berf tê bi qulat e, ne binî ye ne binyat e.
66. Sêva sor hirça kor.
67. Sî dibe bost neyar nabe dost.

(Ş)

1. Şêr şêr e, çi mê ye çi nêr e.
2. Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e.
3. Şipîk şilor e, kî bê dûvê wê tê de kilor e.
4. Şilî şahî ye.
5. Şim û şemamok taxim û îmamok.
6. Şam şekir e, welat jê şirîntir e.
7. Şam dûr e qeyê mişar jî dûr e.
8. Şûr qalanê xwe nabire.
9. Şahidê rovî, dûvê rovî ye.
10. Şûna şera kundê kor danî ye.
11. Şêlim tenik bin dike.
12. Şûjin di çavê xwe de nabîne, derzî di çavê hevalê xwe de dibîne.
13. Şirîniya zevacê heyvekê ye.
14. Şixûla ji ne dil û mil, hemî gerî û mitil.
15. Şirikatî xweş bûya, wê Xwedê şirîkek ji xwe re çêkira.
16. Şixûl şêr e, gava te dest avêtê dibe rovî.
17. Şam xweş e ji Şamiyan re,
lê Wan xweş e ji Waniyan re.
18. Şaqulê ne pêya be, bila sîwarê ker be.
19. Şertê dilsafiyê ne şaşika spî ye.
20. Şerê şove çêtir e, ji qirqira bêderê.
21. Şekala xwe xist tevlê pêlavên camêran.
22. Şixûl û karê xwe be, ezîzê dilê xelkê be.
23. Şeva reş ji êvarê ve kifş e.
24. Şixûlê şevê nêçîra rojê.
25. Şivan bibûn çar, gura pez hemî xwar.
26. Şênahiya gunda ji berahiya rê ve kifş e.
27. Şêx ne batin e lê şixûl ser hatin e.
28. Şûrê hesin çi qas bi pesin, wê biçî ser gûhê gîsin.

29. Şer ji betalî xweştir e.
30. Şeva kidikkûjê bihûrî.
31. Şerm nake, benîştta xwe li eniya xwe daye.
32. Şalê xwe didim te lê lingê xwe tê ve neke.
33. Şûr şer dike, pere hel dike.
34. Şer piştê taştê dereng nabe.
35. Şivan û gavanan li hev dan, cûlakan cirim dan.
36. Şixûlê saetekê xema salekê.
37. Şêr bi lepê xwe, şêx Hadî nayê hewara te.
38. Şewra çûkan li ser garisê Memo ye.
39. Şêr û nivşêr yek e.
40. Şerûdê pîs, du caran şer dixwaze.
41. Şûşa dilan wekî dişke cebar nabe.
42. Şikir şikir Xwedê derpê li me kir.
43. Şêxo û mesor e.

(T)

1. Teyrok tîp û tîpanî, tu ji hesabê salê nizanî.
2. Teşî reqs e, dolap heps e.
3. Tajî dibê ya Allah, kêvrojk ya Allah.
4. Teyr li hewa difirin, dibêjin hem kûf hem kûf.
5. Tamakara rêkin dara.
6. Tamayî ji guyê seyê xiravtir e.
7. Teyrê goştxawarî nikilê wê kêr e.
8. Te jî dî gulek, jê deranî hingivek.
9. Tu bi mal î, bi xaltî û xal î, ku tu bê mal î,
bê xaltî û xal î.
10. Tiştê nivî neke hêvî.
11. Tirb li ser tirba dibe, mal li ser mala nabe.
12. Teşt û dîz hûrik xilas dike.
13. Têjikê jûjû bi jûjû nerm e.

14. Tûrîkê eyban li paş ve ye.
15. Tewnik li dar e, tayê min takî sar e,
tewnik biriye, tayê min firiye.
16. Tifinga şevdora ne, her şev yek davê milê xwe.
17. Tiştêk min li mal e, xiyala min li bal e.
18. Tena xelkê ji azabê qebrê zortir e.
19. Te çi danî beroşê tu dê wê bixwî.
20. Tu li ku mala dawetê li ku?
21. Tir li ku das li ku?
22. Tu were karê min bike, ez jî karê mela û mîr bikim.
23. Tamayî kêmayî ye.
24. Tovê biyê av e (Feqiyê Teyran).
25. Têjikê mijmijakê, ha bike gazî, ha bike gazî, ne dibe başok ne dibe bazî.
26. Tu behsa kî bikî, yan li ber derî ye,
yan li ser kulekê ye.
27. Taliş ku bête firset, mehlet li nik heram e min umrê
Nuhî dirêj nîne sakî were bilez xweş.
28. Teniya bi don e.
29. Tiştê nedîtî, nekirî qise neke.
30. Tiştê te kirî, te dîtî yê te firotî û windakirî.
31. Tiştê bi esas de, dil nekit weswas.
32. Tişt bi xweziya naçe şerî.
33. Te tişt tunebin neçe bazaran, te mêr tunebin neçe
hawaran.
34. Te divê tişt ji min re teşt ji te re, te navê teşt ji te re tişt
ji min re.
35. Tiştê reş, ji roja reş re ye.
36. Tişt germ e, germ xweş e.
37. Tifke seyê, ji xweyê şerm ke.
38. Tiliyê destan hemi ne wek hev in.
39. Tiliya ku şerîet jêke, xwîn jê nayê.
40. Temaşe belaş e.

41. Tu nexwariye, don simêlê wî ve maye.
42. Tu nemaye Xwedê neqedandî.
43. Tu çi bixî kûwarê, wê ew bê xwarê.
44. Tê sotin lê nayê gotin.
45. Tirs mamê gur e.
46. Tas ket deng derket, ha bi rast ha bi derew.
47. Tanêlan xweş tanêlan, kopekan xwe dane ber wan dêlan, cewrikê xwe kiş dikin gelek camêran.
48. Te di rişêmin de rî.
49. Terîqet di vî dem bu damî seyd, ku pê malê dinya bikin bend u qeyd.

(U)

1. Umrê leylekê bi teqerek bihûriye.

(V)

1. Vizvizîn ji we hingivîn ji min.
2. Vê beza kurt û vî meaşê xurt, helbet tişt tê heye.
3. Vê zemanî her kerek, mîmarê dîwarê xweyî xanî.

(W)

1. Weke malxoyê malê silo be,
wê xwarina kilfetê çilo be.
2. Wek xizir e, li hemî cîh hazir e.
3. Werîs çû, heçû pêde.
4. Wextê mirtib birçî dibin, bîra wan li parsê dikeve.

5. Wek gur minnet ji baranê hebûya, wê kurkek (kevlökî) ji xwe re çêkira.
6. Weke hebit baxçe hingî navê axçe.
7. Weke li te xweş tê, li min jî xweş tê, ev çi arvan e li nava teştê.
8. Wek hakimê li teyra xwe poşman bî.
9. Weke meriv hevalê qijikê be, wê nekilê meriv li nav rêxê be.
10. Weke av ser meriv re avêt, çi bihûstek, çi çar tilî.
11. Wek Erebê mal li mil e.
12. Wextê gula, meriv gula diçine.
13. Wile wil tê, ji ciyê kul tê.
14. Wisa bidiyê, ku çav bibîne dev nebîne.
15. Werine bixîşt, werine bixîşt, evan nîvmêran mêrek me kuşt (ev gotin gotina kermêşa ye).
16. Welle xanê ne tu yare, lê welle ez ne çare.
17. Wextê karan kes tune, wextê xwarinê dor tune.
18. Wek qîr û zift e, hişk e neron e .

(X)

1. Xwedê heye, xem tuneye .
2. Xwedê siwaran pêya neke, pêya jî siwar neke.
3. Xwediyê sebrê melikê Misrê, (bûye ezîzê Xwedê).
4. Xwezî bi navê te lê ne bi dîtina te.
5. Xatûna şam û şerqê, ne dixwe ne dide xelkê.
6. Xebata mûrî embaran tijî dike, serê vala jê çi seh dike.
7. Xweyê mirî kor e.
8. Xwedê kevirê mezin daye, kevirê biçûk pê bisekine.
9. Xeta xwer, di bin gayê pîr de ye.
10. Xweyî kir bi nanê xwe, agir berda canê xwe.

11. Xwedê çiya dibîne, befir lê dibarîne.
12. Xwedayo tu gelek pak î, tu vê ewrê ser me de rakî, hevrazê berwarkî, cûherê kerê me tijî ceh û ka kî, serê kerê me tê de wendakî.
13. Xwar rûnê rast xeber bide.
14. Xewna kanûnan tirê meymûnan (tirê xatûnan).
15. Xeberfiroşa ker da gura.
16. Xwîn nabe av .
17. Xweliya şûna prengê ye.
18. Xewn û kew nagîhîje hev.
19. Xweyê qoran, mirî radikin ji goran.
20. Xwîn bi xwînê nayê şûştin, xwîn bi avê tête şûştin.
21. Xorta re tuxub tunîne.
22. Xweyê xêra, dibî rebenê dêra.
23. Xûyê xweyêtî tehle.
24. Xeberê xweş, marê ji kûnê dertîne.
25. Xeberê şekerîn xilas nabe.
26. Xzmet bê minet e.
27. Xweda yek e ne şeş e.
28. Xwedê bide kî, nabê tu kûrê kê yî.
29. Xwedê goşt dide merivê bê diran.
30. Xwedê goşt dide teyrê bê nekil.
31. Xwedê lê anî, nav ji zeviyê re ma cotyar.
32. Xwedê berf didî, da dest û pê bicemidî.
33. Xwedê fêl û emelê mar zanî, lewra dest û pê xistine zik de.
34. Xewa birîndaran tê, ya birçiya nayê.
35. Xwestina ji xwestiya, wek kotina hestiya.
36. Xweş xeber e lê min ne bawer e.
37. Xweş mal e lê pêşî jin e.
38. Xweyê cotjinan her poşman e.
39. Xweliya tifika malê, ji birinca xelkê xweştir e.
40. Xwelî li serê, gayê da bi kerê.

41. Xelk çûne hîvê, derketin hewa lê em dibînin xeyal û xewna.
42. Xizanî jenga mêra ye.
43. Xebat ker e, bajo here.
44. Xwedê meriv nexe tora bê esla.
45. Xew ji êvar de, kar ji sibe de, adan ji bihar de.
46. Xwîna meriv kevçiyek e, navê meriv çiyayek e.
47. Xwarin gend û gu, şuştin reng û rû.
48. Xeber dertên ji mirdalan, spî dertên ji qertelan.
49. Xeber ji nav sî û sê diranan filîtî, sî û sê heban seh kir.
50. Xêra ku li malê diçe, naçe derve.
51. Xeber şikirê keviran in, çi qas hebek bikişînê, hebek tê ber.
52. Xac û xizirnebî, kî li mala xwe nebî, jina wî dimîne jinebî.
53. Xav û pehtî diçin cîkî.
54. Xîmê xwe dayne esas, paşê dilê neke waswas.
55. Xwedê mala şivan û gavanan xirav bike, hê du xeberên me mabûn.
56. Xelîl dibê bibir, Celîl dibê nebir.
57. Xew xewê tine, xew goştê tine.
58. Xeberê êvara dikeve qulê dîwara.
59. Xencer bira ye, tîfing pismam e.
60. Xirav kirin rihet e, avakirin zehmet e.
61. Xwezî xwesû tunebûya, bûk bi dilê xwe bûya.
62. Xwedê yar be, bila şûr dar be.
63. Xulamiya bê maş e.
64. Xela heft salekî, ne wey neyariya salêki.
65. Xîret ji îmanê ye.
66. Xeyda ji xewsa namîne xalî.
67. Xîret avêtine ber seyê, hilneda.
68. Xîret taca zêrîn e.
69. Xîrê bê minete.

70. Xwedê gotiye, ji te ced ji min mirad.
71. Xwedê hefza meriv bike ji mekrê jinan.
72. Xeberê xwe bipêje paşê birêje.
73. Xarzî li xalan canî li felan.

(Y)

1. Yek dihêje sedî, sed nahêje yekî.
2. Yê ku naêşîne nakenîne.
3. Yek yek e, didu zibare, sisê qet lê neke
4. Yek yek e, didu zibarek e, ku bû sisê û çar, êdî qet lê neke.
5. Yan xew e, yan jî kew e.
6. Yan kulav û kêşik, yan jî hars û tendûrek.
7. Yarî yarî paşê dibe neyarî.
8. Yek tazî bû di kuwarê de, digot jina xwe zirav birêse.
9. Yan mêrê baş be, yan jî bivir û das be, yan jî bimir û ji xwe xilas be.
10. Yê ku dest dike, dê û bav nake.
11. Yekî jina xwe berda bû, digotê were bibe yara min.
12. Yarê derewîn carek dixwe firawîn.
13. Yan li pişt dergûşê, yan li deşta Mûşê.
14. Yê ku dixwaze rûkî reş e, yê ku nade herdu rû reş e.
15. Yan dûayê alima, yan dûayê zalima.
16. Yê ebda tevdîr e, yê Xweda teqdîre.
17. Yê bi kotek biçê mazî, nade ser evrazî.
18. Yê hinan mewîj in dinitir in, yê hinan goz in dixirxir in.
19. Yê bê ber sifê, wê bê ber tifikê.
20. Yê guhê xwe nedit mezinan, wê du stirû serê wî ve bê wek bizinan.
21. Yê masî bigire, wê her şil bibe.

22. Yekî got yekî: "Ez ê bi guhê te bigirim dora dinê bigerînim." Yê din got: "Ne wê destê te jî bi guhê min ve be."
23. Yek e wek hêk e.
24. Yekî malê xwe dixwest, zekat lê ket.
25. Yekî jina xwe berda, paşê çû jê hez kir.
26. Yekî got ezê te bibim cennetê, gu ne îro nehşeme.
27. Yekî şalê xwe da yekî, go lingê xwe neke tê de.
28. Yekê malê sisê newalê.
29. Yekî telîs rêst, qiza xwe xweyî kir, yekî lalîsk rêst kurê xwe kuşt. (Lalîsk: Risê ku zirav tê rêstin).
30. Yê borîn ji xwe borîn, yê mayîn bêtir in.
31. Yê ku ji jina xwe natirse, ne tu mêr e.
32. Yê ku bi jina xwe nikare, ne tu mêr e.
33. Yek didu ye, didu edû ye, sisê hîlbû ye.
34. Yar yar, ew silka min date, te peht û xwar.
35. Yekî tayê girt heft sal rojî negirt.

(Z)

1. Zikê bixwe sawarê divê here hawarê.
2. Zêr di zikakan de wenda nabe.
3. Zimano biriyo, seriyo kiriyo, zimano şeqeşeqo, seriyo teqereqo.
4. Zor gêzerê radike.
5. Zarîna singê ji ber mêrê kotî ye.
6. Zimano leq, seriyo teq.
7. Zîp im zîpedar im, bibarim bihar im, nebarim xedar im.
8. Zalim sed caran zalim, giya didimê birevê, jê dimalim.
9. Zikê têr çî hay ji yê birçî heye.

10. Ziko negirî siba îd e.
11. Zavayê ba xwezûra, mînayê seyê ber tenûra.
12. Zikê birçî nake tirçî.
13. Zû kirin, gu kirin.
14. Zeyneba zer e xwe dide kade li ser e.
15. Zêr zanid zor zanid, devê tifingê mor zanid.
16. Zerar du zerar, hem dîz hem girar.
17. Zivistana du bihar, pîra du guhar, jê re nîne ti îtîbar.
18. Ziko têro milo şêro.

Institut kurde de Paris

Metelok an jî Tiştok

1. Aliyê ha dar, aliyê ha dar tê de heye sekî har.
2. Aliyê ha rêx aliyê ha rêx tê de heye xwarina şêx .
3. Al alî nav alan, sedef li serî cizme li lingan.
4. Aldim daldim heşt ling du sim.
5. Behrê kef da, marê çev da, lel hat û dil bi dev da.
6. Çûme çiyayê Batinê, min dît Quranek bi tenê ji belgan nayê xwendinê.
7. Çêlek li mal dizê, golik li ser ban direqêşê.
8. Çûme serê nizarê min kuta deng çû hezarê.
9. Çûme hewrazê min dîz danûyê kilol kir, hate jêrê, heb jê nerija.
10. Çil tax çil bin tax, çil hecî çil qotax.
11. Çar birayên min bi hev re, tîr davêjine golê.
12. Çûme govek tijî kespik e.
13. Çûme Sasûn geram stûn stûn, min dît kalekî bê qûn.
14. Çirçirî pirpirî devê te û heftê bavê te birî.
15. Diçim diçim du çiranebî, diçim diçim du kunrûvî, diçim diçim du şêrt morî.
16. Du birayên min bi hev re tîr davên golê.
17. Diya te sibê radibe birek boxe li pêy ne.
18. Diçim naçim nagêhêmê.
19. Du birayên min li hev dinihêrin.
20. Diçim naçim paşî nayê.
21. Di qûtîkî de pêncî esker.
22. Diçî naçî deng jê nayê.
23. Devê dinyê digire devê cêrê nagire.
24. Diçe ser agir tiştê xweş dixwe.
25. Dibim ser avê ew av venaxwe, kapê wê av vedixwe.
26. Dirî ser kevirê kej yan jî dirî ser kimsoro.

27. Dixûşe mar nîne, diqare kar nîne, şikev e (hincan) dar nîne.
28. Erko di tehtê de.
29. Ez û çîçî çûne çiyê, ji çîçî nebûya ez dimanîma li çiyê.
30. Ez çûme xaniyekî bê derî tê de filleyê bê serî.
31. Ez çûme govek, têde tijî qelaştîk.
32. Ez radibim ew jî radibe, ez rûdinim ew jî rûdine.
33. Ez û kimsoro çûne diziyê, me goşt dizî anî binê kevirê kej xwar.
34. Êvarê dîza min a danûyê tijî ye, sibê radibim vala ye.
35. Gayê kejo li hewan dajo.
36. Gayê qero li bena ro, ne diz dibe ne gur dixwe.
37. Goşt didimê diçe, goşt nadimê naçe.
38. Hin ji min hin ji cin, hin ji gayê mezin, dikevîne pêy hev dibezin.
39. Ha ji van deran, çû ji van deran, cotkovelê nav bêderan.
40. Hetel metel qaziyê keçel, golik û garênan ji nav xwe bixe der.
41. Himhim dikim dimdim dikim, li binê kelê didim, kun dikim.
42. Heşayşîn kafir tu bikşîn.
43. Hêlîna mijmijarê dî nîvê nîzarê, ne siya sibê didiyê ne jî tava êvarê.
44. Hilindir bilindir kur ji bavê bilindir.
45. Hespê nexarandî.
46. Ji min filitî, li te xebîtî.
47. Ji min hate te.
48. Ji kêçê hûrtir, ji rimê girtir.
49. Ji vir û Bexda, kulav çarta.
50. Ji vir û Tewrêz, kodik bûne rêz.
51. Kalo li ser lingek, gavanê gundek.

52. Kalo li ser kûlînê (livîn) çavê kalo dibilbisînê, xwedê kalo ji wir hilînê.
53. Kerê bi lingekî, çû şerê gundekî.
54. Ku ez diçim ew jî diçe, ku ez disekinim ew jî disekine.
55. Mirîşka reşê nav qelaştî.
56. Mirî ye dev vekirî ye.
57. Mêrga nedirûtî.
58. Melayê bê rûyê bê mû ye, kero bêje çi ye.
59. Nîvê kevçiyê bi dîwarê ve sekiniye.
60. Oda şûştî û miştî, du xanim tê de rûnîştî.
61. Qesra spî bê derî.
62. Rîşê kalo bi dar da.
63. Sor e glover e.
64. Sêpêka sêpê, li nîvê deştê, teqil lê didim, beqil jê dertê.
65. Sindîrûk ser sindîrûkê, mifte di destê bûkê, bûk vedike bi neynûkê.
66. Sêling, stû quling.
67. Serî dar e, binî mar e.
68. Sergo ser banan ket.
69. Sêwiyê nemijandî.
70. Serî ji te re, binî ji kerê re.
71. Serbijêr dibe tijî dibe, serbijor dibe vala dibe.
72. Ser gilgile bin gilgile, çav zîq û simbêl bel e.
73. Şeva ter li guher, şeva hişk li guhişk.
74. Tiştêk min heye, li ber kapê xwe mezin dibe.
75. Tenûra qûmxokê, tijî genim e.
76. Tiştêkî min heye datînim digirî hiltînim digirî.
77. Tiştêkî min heye tiştanî, li ser kevirê xiştanî, ji xeyrî xwedê kes pê nizanî.
78. Tiştêkî min heye, li avê didim dişikê, li kevirê didim naşikê.

79. Tarîgan li pişt gan, simo tê gayê me dibe.
80. Tişteki min heye tiştani, nav mêzera siltani, xeyri
xwedê kes pê nizanî.
81. Tişteki min heye li avê didim naşikê, li kevirê didim
dişikê.
82. Tirba xwe bi xwe dikole.
83. Tişteki heye li avê dixim avê diqelişîne, li kevirê
dixim, av jê dertîne.
84. Wîtwîtok seran diçêre.

Institut kurde de Paris

Bersiv

1. Zarok
2. Hingiv
3. Ribês
4. Şîn û Mêzin
5. Çira
6. Kiyark
7. Agir
8. Ewr an jî topan
9. Hinar
10. Mîrok
11. Guhanê çêlekê
12. Çavê pez
13. Qijnik, Nuj, (Kirnî)
14. Aş
15. Çav, difin (poz), diran
16. Guhanê pez
17. Por
18. Sî
19. Tifik û kulek
20. Rê
21. Nift
22. Av
23. Pere
24. Beroş
25. Çira
26. Ziman û diran
27. Kûsî (Kîso)
28. Rîş (Rûyê zilama)
29. Çav
30. Zebeş
31. Stûrê bizinan

- 32.Sî
- 33.Ziman û diran
- 34.Stêrk
- 35.Sûma dewê
- 36.Pirr
- 37.Pêlav
- 38.Kotan
- 39.Kêvroşk
- 40.Mozeqirt
- 41.Mîrok
- 42.Bîr
- 43.Ziman
- 44.Darkulek
- 45.Taxûk
- 46.Axaftin
- 47.Deng
- 48.Berkenif
- 49.Befir
- 50.Stêrk
- 51.Dankut
- 52.Pisîk
- 53.Bivir
- 54.Sî
- 55.Bixêrî
- 56.Meşk
- 57.Por
- 58.Dîk
- 59.Guh
- 60.Goz
- 61.Hêk
- 62.Derî
- 63.Tametêz (balcanê sor, frengî, doşav)
- 64.Sûma dewê

- 65.Sîr
- 66.Sobe
- 67.Werîs
- 68.Qalax
- 69.Çûkê mirîşkê
- 70.Genim
- 71.Demhêjmêra quer (saet`a qumê)
- 72.Kêvroşk
- 73.Mar û qiloçê pez
- 74.Kundîr
- 75.Stêrk
- 76.Zincîr
- 77.Zarokên di rihma dê de
- 78.Kaxiz
- 79.Poça ga û simê ga
- 80.Zarokên di rihma dê de
- 81.Hêk
- 82.Dilop
- 83.Darê Mûsa
- 84.Cozan

Institut kurde de Paris

Mar û tirba spî

**Heta bîra min li dûvê qot bê, ya te jî li kêla spî bê,
qîma me li hev nayê.**

Hebû merivekî pîr û belengaz. Ew xwediyê pezên spî û reş bûn. Her roj serê sibê, di bin bêhna rojê ya pêşîn de ew ji mala xwe derdiket û pezên xwe dida ber xwe û diçû çolê. Heta ku wan biçêrîne, wî mirovî xweş pif dikir bilûrê. Û heta ku wextê xwe biborîne, li bilûra xwe dida û stranên zîz û melûl dinewirand û digot.

Rojekê ew di nav kûlîlk û giyan de bi xişexişekê hesiya û dû xwe nihêrt. Dît ku marekî mezin ber bi wî ve tê. Mar çend gav ber bi wî ve hat û lê bi derbekê rawesta. Rabû ser dûvê xwe û dest bi dîlanê kir. Mar wextekê dirêj bi kêfxweşî reqisî. Mîna di dema gulana maran de û dawî vegeriya kûna xwe û car din jê derket, hat pêş Şivan û zêrekî zer danî ber wî. Mar û mirov pir nebortî, hînê lihevhatinê bûn û êdî çî bihar çî havîn, her roj serê siban di wextê xwe de ku marî dengê bilûrê dibihîst û dihat pêş pîrê, bi dilşadî direqisî û piştî vê wî zêrekî datanî pêşiya Şivan.

Du sal neqediabûn ku Şivan bû dewlemend û her wekî ew dîndar bû. Rojekê gote xwe:

"Ez bûm dewlemend, min divê herim mala Xwedê tewaf bikim." Piştî vê qîrarê mirovî bang li kurê xwe kir û hal û hewalên xwe û marî pê da zanîn û gotê:

"Kurê min, dewla serê vî marî em bûn dewlemend.

Dotira roja çûna min divê tu sibê de pezên me bidî pêş xwe û herî cîhê ku min nîşanî te da û li wê li bilûrê pif bikî. Tu dê bibînî ku marekî zêrdil dê bê pêşiya te û ew bi çelengî û nazdarî dê bireqise û piştî qedandina dîlanê ew dê ji te re zêrekî zer bîne û deyne ber te.

Lê lawo, we nebe ku tu bi qesta talankirina qenciya marî bikî û wî bikûjî. Divê tu xweş bizanî ku eger tu wisa bikî, dê qeda û bela bikeve mala me."

Dotira roja ku mêrik berê xwe da hecê, lawik bi pez ve çû cîhê nîşandayî û dest bi lêxistina bilûrê kir. Demeke kurt borî, çavê lawik bi marê ku ber bi pêş dihat ket. Mar her wekî bavê wî jê re gotibû, di pêşberê wî de rawesta.

Lawikî pifkirina xwe hê jî xweştir kir. Marî xwe berda ser xweşiya semayê, mîna levenekî di avê de weke terhekî li ber bayê xwe dihejand. Diket aliyên çep û rast û direqisî. Di dawiyê de mar vegeriya kûna xwe, zêrekî anî û danî ber lawik. Mîna ku bavê wî jê re gotibû, êdî her roj serê sibê lawik dihat cîhê marî û li bilûra xwe dixist.

Lê wextekî dirêj neborî ku xortê me jî mar eciz bû û gote xwe:

"Heta kengê ez dê xulamtiya vî marî bikim? Bavê min mirovekî pîr û sist bû, ne çavsor bû, lê ez ciwan im, ez xort im û jêhatî me. Bi Xwedê ez dê vî marî bikûjim û gencîneya wî talan bikim û xwe û bavê xwe, dûndanên xwe jî dîlîtiya mar xilas bikim."

Lawik ku carekê qerar da, hema şûrekî peyda kir û wî ew şûr kir bin kulavê xwe û bi pezên xwe ve mîna edetê çû cîhê ku em pê dizanin û dest bi pifkirina bilûra xwe kir. Mar hat mîna her roj bi dilpakî sema kir û piştî demekê mestiya. Lawik jî fersend dît û bi şûra xwe li marî da û dûvê wî qetand. Lê di vê hengamê de mar jî pê lawik ve da. Jehra marî gelek xurt bû, lawik di cîh de bêhiş ket û jibîrveçûyî ma. Cendekê wî nepixî û ber bi êvarê mir. Xelkê gund gava dîtin ku roj çû ava û lawik nevegeriya mala xwe, gelek li ber wî ketin û hema bi şev lê geriyên. Wan ew ber bi nivê şevê peyda kir û her wekî ew kurê mirovekî dewlemend bû, jê re dercîhê ku ew mir di bin

darê bîşengan de tirbeke spî ava kirin û wan ew tê de veşart.

Roja vegera heciyan hatibû û xelk çûn ser rê pêrgîna wan. Gava bavê lawik di nav xelkê de kurê xwe nedît, di canê xwe de bi êşeke kûr hesiya û di xwe de got:

"Xwedê dizane lawê min bi qurbana sergermiya xwe bûye."

Bavê reben gelek qehirî, lewma kurê wî li ber dilê wî gelek şîrîn bû, lê tolvêkirin nehat bîra wî. Li nik wî berpirsiyar lawê wî bû. Her çi jî bêje, dotira rojê ew pez dan ber xwe û çû cîhê zanî û dest bi leyîstina bilûra xwe kir. Mar ji kûna xwe derket, lê nêzîkî lê nekir. Mirovî got:

"Heyran çima pêş ve nayê û mîna berê sema nakî, ma em ne hevalên hev in?"

Mar lê vegerand û got:

"Heta ku ev tirba spî pêş çavê te de be û dûvê min ê qetandî ber çavê min be, êdî di navbera me de hevaltî çênabe."

Û marî bê ku li hêviya bersiva pîrî bimîne, dev jê berda û vegeriya kûna xwe.

Ev çîrokeke Kurdî ya pir bi nav û deng e.

Fêl fêlê perê, sim simê kerê

Dibêjin hebû jineke dizek
Bi navê perê xwedanê kerek

Di gundê tê de merivek evdal
Bostanek danî, tirş û tûj û tahl

Ji bo zarokên xwe yên stûxwar
Gelek emek da, pê re cefa xwar

Heta ku bostan baş çêbû gehişt
Perê mirazê wan di çav de hişt

Perê siwar bû di kerê şeytan
Bi şev hicûm kir xwe berda bostan

Li ser kerê wê qetand û xist bar
Yê ku ji ber ma kire tarûmar

Siba wê şevê xweyê belengaz
Hat ku jê biçine qetik û pîvaz

Çavê xwe gerand dî rêça kerê
Go: Simê kerê lê fêlê perê

Mesela rovî û kerê gundî
Ew jî wiha ye, dibe te xwendî

Birê perê û roviyê dekkar
Îro dinya tev birayê guhdar

Bi sim û dîvê kerê xwelîser
Diçin diziyê dikevin her der

Ne bi neyartî belkî bi dostî
Ji meriv dikin kiras û postî

Mamoste M.S.

Institut kurde de Paris

Kurmê darê ji darê nebe
Zewala darê tu nîne

Rojek bivir û dehl bi devejengî
Herdu hatin hev deranîn dengî

Dehlê jê re got: Tu nakî fedî
Ev zilma dikî nake kesek dî

Wan têjikê min taze ciwanî
Ji kok ve dibirî nadî emanî

Tu nahêlî ew ji erdê rabin
Bi mirazê xwe ji xwe re şabin

Bi xwe bigihîjin rabin bibin dar
Fîdan ji wanan bigihîjine kar

Ji bo çi dikî vê zora hanê
Vê fitwa vajî ji kû ve anî

Dibe ku te jî li nav diyara
Guhê xwe daye peyvên neyara

Bivir jê re got: tu yê gunehkar
Wek kewa gozel ji xwe re neyar

Ji te nebûya destiyê bivir
Çi ferqa bivirê hebû ji kevir

Te seh nekiriye ji bav û kala
Wan dunya dîtî borandin sala

Ger kurmê darê nebûya ji darê
Tu car nedibû zewala darê

Birayê guhdar çi borî tev hêç
Dibêm eva hirç, dibê eva rêç

Mamoste M.S.

Institut kurde de Paris

(Mêş û mûrîstan)

Min li ber tavê dest û lingan disot

Te jî li ber guhê lawikan lawjan digot

Roja ku çêbû, mûrîstanga jar

Di gel wê mêşa reşa ziyankar

Tiştê ku mêş dît, revand û xwarî

Li rojên paşî nedikir guhdarî

Kete kêfa xwe ew mêşa bextreş

Hey saz di destan wek wanên serxweş

Digota: Her tim dunya havîn e

Tirsa zivistan di bîrê nîne

Ji dew, ji xwîna heywanên dûvqol

Zik lê werimî mînanê dihol

Zik lê werimî mîna wanên din

Ewên ku malê feqîran dixwin

Em bên ji bona mûristanga jar

Siban radibû hetanê êvar

Tim dixebitî çî karî bikir

Ew pir hildida hindikê dixwar

Digo: ger îro cefa bikişînim

Di roja tengî xweşî bibînim

Mêşa bê tedbîr dît ku zivistan

Hat befir û bager dinê kir dûman

Got: Wê çawa be? Ez mame bê qût
Ez mame birçî, bê çek û çîrût

Rabû çû derê mûristanga jîr
Jê re got: cîran ez mame feqîr

Ne nan û dew e, ne qût û qelat
Tişteke bide min mirin ji ma hat

Mûrî jê re got: Min ji ter negot?
Hê ku havîn e, tevdîr bike qût

Guh te neda min wekê wanê piz
Piştî xwe da min, te kir vize viz

Di wextê ku min xwêdan dirêta
Te xwîna xelkê xwe re dimêta

Di wextê ku min pepikan disota
Te jî lawjanan bo xwe digota

Rabe ji ba min, biqêşte here
Li çarekî dî bo xwe bigere

Piştî ji wê çû ew mêşa bêbext
Ji jor de wer bû hat li erdê ket

Ewê me gotî ne qîl û qal e
Ne xewna xam e, ne jî xiya e

Ji sedî not û nehê xizanî
Bawer dikim tê ji ber nezanî

Kesê ku mîna mêşa reş bike
Çi bê serê wê jê re hindik e

Mîna min û te birayê guhdar
Em nexebitîn mane ber dîwar

Mamoste M.S.

Institut kurde de Paris

Min diz berdaye ew min bernade

Şêr û hirç û gur hev girtin wek zip
Di gel roviya pir fend û pir lêp

Bûne ji hev re her wekî bira
Geriyan li dinê çend roj bi hev ra

Wextê fireh çû hat wextê berfê
Li hevdû kom bûn ew ketin şêwrê

Ji hev re gotin tevdîr bibînin
Çend heb pezên xurt ji çolê bînin

Kûpeke mezin qelî em çêkin
Vê zivistanê xwe pê xweyî kin

Gur çû kerîkî anî çend peza
Berê hirçê jî dane nav reza

Şêr ma li male rovî jî çû dar
Kûpeke anî hirça hov û har

Pehtin qelandin kupeke qelî
Ji roja teng re xistin bin xwelî

Çend roj bihurî roviyê xayîn
Derkete derve û kire qarîn

Gotinê; bira xêr be çi bûye
Got; li gundê jêr zarokî bûye

Got; ez nikarim ku bême wi ra
Hûn pir maqul in hun herin vi ra

Dibên were vir lê kesî neyne
Dewla serê xwe navek lê deyne

Min ji wan re got: Nikarim ez bêm
Kengê hûn mezin, û emê kê

Tev jê re gotin: Birayê zana
Em cahil in tev, guh nede wana

Tu rabe here navka wê jêke
Ji bo dilê wan, navek jî lêke

Bi mirûçkek pîs jiba wan rabû
Xwe wî winda kir li rê bi ba bû

Xwe berda ber jêr çû ciyê qelî
Zikê xwe dagirt, ji kûpa bin xwelî

Dev xwe paqij kir zû hate ba wan
Piştî ku bi wî xêrhatinê dan

Gotinê: Bira gelo te ça kir
Got: Min navê wî danî devvekir

Nikarim bikim li wan navek xweş
Ji kerê reş re babet e kerbeş

Piştî çend roja roviyê çilek
Dîsa birçî bu ket hîle û dek

Her wekî berî dîsa hat û çû
Digot: Vê carê navê wî nivçû

Cara sisêyan roviyê da lot
Bi dengê dijwar gazî kir û got

Serê we bixwe we serê me bir
Bes e mirina we, ji me re çêtir

Zarek we ku bû hun vir da meynin
Yan jî navê wî li ba xwe deynin

Derdê me tune tim bi we ve bin
Her sibe êvar li dûv we kaş bin

Ê dinê gotin ev car jî here
Dilê wan neşkên û zû vegere

Gote wan ev çûn ji bona we ye
Rûmet ne ê wan ji we re heyê

Rabû çû berjêr ê mabû derxist
Hinekî jê xwar bin kupê alist

Ê ku ji ber ma ewî jî veşart
Dev xwe paqij kir zû zivîrî hat

Berê xwe da wan got: Bi serê şêr
Êdî ez naçim ewî gundê jêr

Berfê xwe danî li serê çiyân
Gazî hev kirin li hev civiyan

Gotin: Em herin qeliya xwe weynin
Hinde em bixwin li ba xwe deynin

Rabûn bi hev re bi aliyê gelî
Bi kêf û şahî çûne ser qelî

Ji nişka ve dîn ewrek bextreşî
Xweda nava wan ji jor da xweşî

Dîtin ku kupa qeliya wan vala
Ji hev ra gotin: Li me ebdala

Roja tengasî bi ser me de hat
Em man şeperze bê qût û qelat

Bi dilşikestî bi qelbekî kul
Vegeriyan hatin lê bûn ji hev sil

Teva sund xwarin me hay jê nîne
Xwarî ku hebe ji gundê jêrî ne

Yan mişk û mar e, we yan jî cin e
Ev îşê ewha pîs ne ê me ne

Rûviyê bi dek binêr çawa ke
Toza jîna wan wê çawa ba ke

Şevê ji şevan rûviyê dekkar
Xoy xiste çavê xwe maye hişyar

Bi qeliya mayî devê gur seyand
Bi lez çû ba şêr lingê wî hejand

Got: Bira rabe min dizê me girt
Ew xilas nabe eger bêje pirt

Şêr ji xew rabû çavê xwe vekir
Bi hêrseke pir xwe gihande gur

Li nava pişta wî lepekî xist
Dil û hinava di dev de derxist

Ê kir bi gur ra anî serê hirç
Goştê wan xwarin heta post û pirç

Ji ber vê qasê dibêjin rovî
Nehişt xwariye heywanê kovî

Piştê çendekê go ê hîlekar
Ji min re nabe felek her tim yar

Feleka xayîn bi fetil û çerx e
Van kirinên min rojek wê derxe

Çirayê tu kes hetanê sibê
Hilnabe her kes ev gotin dibê

Ev çi bû min kir bê pişt û bê mêr
Ez mame tenê li ber bêhna şêr

Ne ez dikarim xwe bidim alî
Ne jî diwêrim bikim hevalî

Neynim serê wî hîlekî mezin
Ji dest wî nabe rizgariya min

Rojek bi hev re derketin çolê
Rovî mişkek girt li devê golê

Avêt devê xwe kire zare zar
Şêr gote rovî, ew çi bû te xwar?

Rovî got, mîrêm pir mame birçî
Ji bê qidûmî hişê min diçî

Ji cî min derxist çavê xwe yê rast
Avêt devê xwe zarîn ji min hat

Korbûnî derdek giran û zor e
Mirina ji birçî pir jê dibore

Şêr gazî wî kir, gotê bira
Dikarî werî hetanê vira?

Ez ketime çoka min nîne lebat
Ji ma jî derxe çavê min ê rast

Çavê wî derxist bi destê çepê
Mişkek da deva çav avêt devê

Çavê çepê jî bi destê rastê
Deranî wek mû ji nava mastê

Êşa çavê şêr ewî kir hişyar
Bi hîlê rûvî kire xeberdar

Got: Dizê qelîyê wê ew be sade
Min wê berdaye lê ew min bernade

Malê me jî xwar, bi hev da kuştin
Paşê zivîrî hate dora min

Rovî bi lêp girt, piştta wî şikand
Jê heyfa kevin û ê taze stand

Pencê xwe avêt çavan deranî
Li ciyê çavê xwe ewî danî

Birayê guhdar, karên bi dijmin
Wekî ku dibînî meriv dixe bin

Zefera rovî di hîlê kirî
Ger nebûya ev nedihat serî

Xûdbîniya şêr serxweş û sermest
Ji rûvî re kir wî şêrî bindest

Ev tiştê ewha meriv dixapîne
Ji nav biçûka mezin dertîne

Ji vî me zanî ev êş û birîn
Meriv radikin ji xewa şîrîn

Eger nebûya êş û derd û kul
Çira tim zarên wê bikira bilbil

Dersek mezin e evê me gotî
Ji merivbaş re ne bo ên kotî

Şer û hevala gelo te zanî
Ji bin behrên kûr cewher deranî

We ya mîna do mayî di xew da
Wan zêr û zîva ji dest xwe berda

Îşê dinyayê ev e yan ew e
Ev jîna hanê kew e yan xew e

Ev şêrê hanê kurê ewê par
Ê ku xwe avêt ji jorê zinar

Evê me gotî tev zêrê zer e
Kesê ji erdê hilde zêrker e

Mamoste M.S.

Institut kurde de Paris

Rehmet li gora kefendizê berê

Hebû mirovek her wekî kapûs
Bê bext û xayîn, diz û bênamûs

Şer û fedî qet li cem nemabû
Heya li nik wî tenê heya bû

Ji mezin û biçûk, ji jin heya mêr
Kesê ku bimira bi şev digirt bêr

Di gel tevrê jî diçû mezarê
Ji ser dipişkaft hetanê xwarê

Kefen dertanî ji miriyê bêcan
Li cîkî difrot dihişte ûryan

Weha borandî zemanekî pir
Wî kefendizê fasiq mizawir

Heta ku şevê bavê xwe yê mirî
Yek dî di xew de tazî û digrî

Jê re got: Lawê min wî berazî
Kefenê me bir, me hişte tazî!

Ne tenê ê min, tamam weha ye
Bi me tevan yek kefen nemaye

Wî kurkerê tev hilanî û bir
Em rût û tazî mane bin kevir

Vêra şiyar bû bi tirs û lerzî
Çû nav mezela bi lez û bezî

Mezara bavê xwe kola, vekir
Selê ser hilda kûr lê mêze kir

Gava ku wî dît, bavê wî tazî
Girîn bi wî ket, wî kire gazî

Gundî tev hatin bi tena sola
Her kes mezela kesê xwe kola

Kefenek nedîn kirin mizemiz
Bi şêwr û pirsî nasîn kefendiz

Êrîş dane ser berazî kuştin
Zanîn bela ji derê xwe miştin

Kurekî jê ma xîş û bêtertîr
Pir pir ji cehşê heyîn wêdetîr

Rihê xwe berda, dûr xiste dîman
Xwe ehlê xwedê bi xelk da nîşan

Bi roj serê wî di secdê de bû
Bi şev di dora miriyan li ba bû

Tenê kefenê miriyan nedibir
Tewle bi selê wanan sel dikir

Kesek nikarî zû wî bizanî
Piştê mirar bû derket meydanê

Jiber vî qasî mesel û derb e
Rehmet li kefendizê berê be

Birayê hişyar her wekî xanî (vanî)
Van kefendiza karî te zanî

Wan kefendizê bê dîn û îman
Di dest wan bêr di dev wan Qur-an

Mamoste M.S.

Institut kurde de Paris

Neyarê bava nabin dostê lawa

Salek ji gur re xwedê xira kir
Se û şivan tev lê bûne agir

Kombûn li hev gur, pir çûn û hatin
Bi dara şêwrê dîza xwe pehtin

Hinek ji wan got: Em wekî berê
Serê xwe bidin li ber vê derê

Xwedê dide me yan jî dide wan
Ne wisa gotin, ê pir bû ji wan

Zeman, zemanê hîle û fetla
Ne ê bê mejî, ne ê bê eqla

Çend pîçê zana ji xwe şiyandin
Wan şîret kirin kerî gîhandin

Çûne cem kerî ûzrê xwe xwestin
Li we ne heq in, em dîn û mest in

Ji wan re gotin: Em birayê hev in
Ê mina me û we, hê li ba hev in

Fesad û nexwaz bav û kalê xav
Li hev kiribûn wek agir û av

Bes e neyarî, bes e xwînxwarî
Çi ye kîndarî, xayîn û xwerî.

Ji bo dostiya wan nebe derew
Çend têjikê xwe dane hev gerew

Gotin kirin yek, peymanê bestin
Çûn dest û rûyê hev xatir xwestin

Çend roj borandin dilxweş û dilşad
Şivan rihet bû se jî bê feryad

Bê se û şivan çû çiyê kerî
Derê goman tev mane vekirî

Guran ji xwe re dîn keys û fersal
Kerî tev kuştin ma miyek topal

Miya bi tenê belengaz û jar
Ew ma bi kalên û xwe da ber zinar

Çendan lovandî ji kul û derda
Pezek kûvî dît û pê re xeber da

Jê re got, bese xwînê birije
Çi hat serê te ji min re bêje

Miyê got, pismam derdê min kûr e
Nayête gotin, pir hûr û dûr e

Nayê hemêza Şergo û Ristem
Pir me hêsîra xwar, zor û stem

Kurtê wê eve: Dijmin me xapand
Bi biratiyê nava xwe kewand

Hinek ji me xwar, hinekê dî kuşt
Ez mam bi tenê bê pal û bê pişt

Kovî got: Dijmin tiştêkî hindik kir
We dinya nedî, we qey sehnekir

"Neyarê dijwar ê kal û bava
Dost nabe ji lawa ra bi lava"

Mamoste M.S.

Institut kurde de Paris

Vizvizîn ji we, hingivîn ji me

Dibên hebûye di dewra çûyî
Merivek pir nehs gelek pêkbûyî

Navê wî Elo, dizê hingivîn
Bi şev nediket bi nava nivîn

Li xwe dikira cilikê rizî
Xwe hazir dikir ji bona dizî

Gava ku pêşa tarî biketa
Ew jî ji malê zû derdiketa

Diçû diketa nav kuwarmêşa
Şanê hingivîn ji wan dikêşa

Tijî dikira eyal û meşkan
Dev girê dida bi girê hişkan

Dida pişta xwe hingivê delal
Bi yek bêhnekê dihat heta mal

Hingivê tanî bi ten nedixwar
Dida xelkê jî her kes jê dixwar

Ji kîsê xelkê evî xweşmêrî
Gelek dizanî bike camêrî

Bi vî awayî jibona jînê
Ewî dikira tim tekoşînê

Rojekê bi xwe re wî kire peyva
Ev dizî rojek derkeve derva

Bi vî awayî ev karê hanê
Rojekê wê bê derkev meydanê

Dê xelk nebêje çi kar û îş e
Ne te kuwar e, ne heye mêş e

Bi pere bêjim jibona çend car
Dê çi bibêjin jibona her car

Wê gavê nanê min jî dê biçî
Jin û zarok tev bimînin birçî

Navê diziyê navekî xirab e
Wek qîr û zift ji meriv nabe

Ji her tiştî re lazim e zanîn
Zû dertê derve tiştê bêzanîn

Ji bo diziya wî nebe diyar
Çêkir kolikek xistê çend kuwar

Çend moze-qirtan ewê peyda kir
Xiste kuvarê tê de bi cîh kir

Her tim û daîm hingiv dida wan
Dabor dikira rojê xwe bi wan

Rojek li wanan wî kir guhdarî
Ka ew çi dikin, dikin çi karî

Wî wanan dît ku dixwin hingivîn
Bi hev şa dibin tim dîkin vizîn

Ji wan re gotî: "Gelê mêşê min
Vizvizîn ji we ye hingivîn ji min"

N.B.

Institut kurde de Paris

Ser bide sir nede

Sirre parêzgeh ji bo bindestan
Dorgirtin arman ji bo serdestan

Ev e defîne pir qedr û qîmet
Tiştê tê de tev pir gewre û rûmet

Diz û pizê wî gelekî pir in
Li dor diçerxin mînanê gur in

Mît û ajan in, CIA'yê sîxûr
Hawîr dibazin dikin zûrezûr

Ji bo bidizin hinekî sirran
Xweş digerin dolaba virran

Gelê perçiqî ji wan re gog e
Bi wan dilizîn di dest wan çog e

Didin dolar, lîra û dînar
Meriv dikirin rind dikin tîmar

Dibin heywan û diçin nav hewşan
Dibin wek kerê di nava ceşşan

Bêhiş difiroşe, zordar dikire
Binyad û kokê wan pê dibire

Qûlêla sirran pir reş û tarî
Ger zana jîr bî, tê de diborî

Ger jê biborî ji wir da jîn e
Mijokê xwînxwar li jêr dimîne

"Dawî dibêjim birayê guhdar
Tu guh bidêre, rind bibe hişyar"

"Ger bidî serek dişkînî cêrek
Ger bidî sirrek dişkînî birrek"

Nebe ji kesê bê hiş û pîvan
Nikarin bigrin di dev xwe peyvan

Ez im Ciwanê dijminê hovan
Xelkê ketî re ez im dilovan

N.B. 1977

Institut kurde de Paris

Çend mesele ji Seîdê Kurdî (Bedûzzeman)

K. Atatûrk û Seîdê Kurdî

Dibên rojekê Kemal Atatûrk gazî Seîdê Kurdî dike. Li ser daxweziya wî Seîdê Kurdî tê balê û ji xwe re suhbet dikin. Di navbêhna suhbetê de gotin tê ser Kurdan.

Kemal ji Seîdê Kurdî re wiha dibêje:

"Gelê Kurd gelekî beredayî ye, jêtîş û qebiliyeta wan kême." Li ser vê Seîdê Kurdî lê divegerîne û dibêje:

"Ev gotina te pir çewt û xelet e, nayê pejirandin."

Kemal lê divedigerîne û dibêje:

"Çima çewt û xelet e?"

Seîdê Kurdî weha bersiv dide:

"Were ez û tu hazir in û em li ser xwe û te vê meseleyê devejeng (gengeşî) bikin. "

Kemal dibêje; "Yanê çawa?"

Seîdê Kurdî weha dom dike:

"Mezintirê tirkan tu yî û ê kêmtirê Kurdan jî ez im."

Kemal: "Çira tu yî?"

Seîdê Kurdî weha dibêje:

"Di bajarên Şerqê de ê paş de mayî Bilîs, Dêrsim û Hekarî ye, di qezayên Bilîsê de jî qezayê herî kême jî Hîzan û Motkan e. Û di gundê Hîzanê de gundê kême jî gundê min ê Nûrsê ye. Lewra 10-15 mal e û di gundê me de jî ê kême bavê min e. Lewra ew gavanê gund e. Ez kurê gavanekî Kurda me, tu jî mezintirî Tirka yî û navê te jî Atatûrk e, ano bavê Tirkan î. De were! Ez û tu di ilm û mantiq û felsefê û ê mayîn de devejeng bikin. Ka kî ji me bêtir dizane?"

Li ber vê gotinên Seîdê Kurdî, Kemal bê bersiv dimîne û nikare ti tişteki bibêje.

N.B.

Seîdê Kurdî (Bedûzzeman) û Rêveberê Mûhasebê

Seîdê Kurdî dema ku li Îstenbolê bûye, dersê feqiyan daye. Bi xwe meaş nedistan. Lê belê feqiyên wî bi meaş bûn. Demekî dirêj meaşên feqiyan nayê dayîn. Ji ber vê qasî Seîdê Kurdî radibe û diçe ba rêveberê mûhasebê û jê re dibêje:

"We zemanekî dirêj e meaşên feqiyên min nedaye. Hoy û sedema vê çi ye?"

Rêveberê (Mûdûr) Mûhasebê dibêje:

"Seyda! Emê meaşê feqiyên te bidin, lê belê hesab pir teklê hev bûye, jê re zeman divê."

Seîdê Kurdî dibêje:

"Ka bîne ezê niha çêkim."

Li ser vê daxwaziya wî rêveber hesabê datîne ber û dibêje:

"Fermo!"

Seîdê Kurdî pênûsê hildide û dest bi karê hesabê dike, di demekê kurt de hesabê bi cîh tine û datîne ber rêveber.

Rêveber li serî pêgeriyek (lêgerîn) dike, lê belê ti çewtî tê de nabîne û sosretmayî dimîne û destê xwe digezîne.

Jê re dibêje:

"Parastina (hevza) Xwedê li te be! Me nizaniya ji Kurdan ê wek te hene. Me digot Kurd ji hesabê çi fêm dike û me digot, 'Kürt ne bilir bayrami, fir fir içer ayrani.'"

Seîdê Kurdî lê divegerîne û dibêje:

"Em ji we tirkan re weha dibêjin."

"Türk ne bilir kitabi, zir zir içer şarabi!"

Li ser vê bersivê rêveber li ber Seyda bêbersiv dimîne û dest datîne.

Seîdê Kurdî (Bedûzzeman) û Şêxên Hîzanê

Dibêjin dema ku zagoniya (kanûn) hûrriyet û musavatiyê (azadî û wekhevî) derdikeve, şêxên Hîzanê li hemberî vê zagonê derdikevin. Şêxê Hîzanê Mela Selîm (û ew jî bi eslê xwe xelkê Bingolê ye) di hemberî vê zagonê de helbesteke bi zimanê Erebî dinivîse. Ew helbest weha ye:

Hurriyet-ûn hurriyet-ûn binnarî,
Îs ennea textessu bîl-kuffarî

mena wê jî ev e:

Azadî babetê bi agiri ve ye
Lewra ew taybetê bi fillan e

Gava ku Seîdê Kurdî vê helbestê dibîne, li xweşê wî naçe
û li hemberî wê helbestê, helbesteke bi Erebî çêdike.
Helbesta wî jî weha ye:

Hurriyet-un etîyet ûr- rehmanî
Îz ennea textessu bîl-îmanî

Wergera wê jî weha ye:

Azadî dayîneke Xwedayî ye
Lewra ew taybetê bi îmanê ye

Seîdê Kurdî pir azadîxwaz bûye, heta azadî ne tenê ji
însanan re pêwîst e, ji her candarê re pêwîst e. Di
afirandina her sewalê (heywan) de azadî heye. Û ji bo
azadiya xwe tekoşînê didin. Seîdê Kurdî di pirtûkeke xwe

de bi navê Reçete-tul Ûleme, rûpela 165 an de weha tîne ziman:

"Ji heywanê hov re en xweş azadiya wî ye, ji ber azadiya xwe bûye hov."

Belê ger ji heywanekî hov re bêjin were bikeve bin nîr û emrê însanan, wê zikê te têr bikin, dê kêf û xweşî bibîn! Bê guman bersiva wî dê weha be: Na! na! Ji me re azadî bes e. Ev pêjnên hana di sewalan de jî heye. Heywan ku heywan e jî, di gel hemnijadê xwe li çol û çiyar, di şikeft û rêlan (daristan) de birçî û perîşaniyê dikişîne canê xwe, lê dev ji azadiya xwe bernade. Lê bedaxewe (mixabin) hê jî ev rihê hanê di hinekî me Kurdan de ti nîn e. Lewra ne azad û jar û belengaz û xizan in.

Ava Sapkorê xweş av e lê ku mîz û guyê Şikranisê (Qemerê) nekeve nave.

Sapkor û Şikranis navê du gundan e. Girêdayî bi qezayê Tetwanê ve ye. Sapkor gundekî ji fillan maye. Ev gundê hanê pir bi av e, avên wê pir bi nav û deng e, dema ku fermana fillan radibe, fille tev jê derdikevin û jê mihacir dibin. Li her cîhan belav dibin, hinek ji wan jî diçin Îstenbolê û li wir nişteçîh (yerleşik) dibin. Yek ji xelkê Şikranis jî mala xwe dibe Îstenbolê û ew jî li wir nişteçîh dibe.

Dibên rojekê ewê Şikranisê dixwaze ku biçê ziyaretiya gundê xwe. Di vê navbêhnê de yekî ji filleyê Sapkorê dibîne û jê re dibêje:

"Kirîv! Min dil heye ez herim welêt, ti daxwaziyên te ti nîn in?"

Mêrikê fille lê vedigerîne û dibêje:

"Gava ku tu çûyî welêt, xêra bavê xwe di veğerandinê de sewîlekê ji ava gundê me yê Sapkorê ji min re bînî. Bila nemîne hesret û kovên di dilê min de."

Mêrikê Şikranisê dibê:

"Li ser ser û çavên xwe, ez dê ji te re bînim."

Mêrikê Şikranisê tê welatê xwe û diçe gundê xwe. Piştî zemanekî niyet dike ku dîsa bizivire Îstenbolê. Pê re daxwaziya mêrikê fille dikeve bîra wî. Bi qederekê hindik Sapkor ji gundê wî dûr bûye. Mêrikê Şikranisê qam nekiriye ku here Sapkorê. Bi xwe bi xwe ji xwe re weha dibêje:

"Ezê çi herim heya Sapkorê. Jixwe ava Sapkorê di gundê me de derbas dibe. Ezê hema li vê derê sewîlekê tijî bikim û jê re bibim."

Radibe sewîlê hildide û diçe ber avê û sewîlê bi avê tijî dike. Û dîsa dikeve rê û vedigere Îstenbolê û tê mala xwe.

Mêrikê fille tê ziyareta wî. Ew jî sewîlê avê dide wî û dibêje: "Eva ava Sapkorê ye, ha ji te re têr vexwe û hesreta xwe birevîne."

Lê mêrikê fille pir zana û şaraza bûye. Çawa avê vedixwe, pê re bi tama wê dihese. Mêrikê Şikranisê jê re dibêje:

"Afiyet û noşîcan be. Ava wê çawa ye?"

Mêrikê fille lê vedigerîne û dibêje:

"Ava Sapkorê xweş av e, lê ku mîz û guyê Şikranisê (Qemerê) nekeve nave."

Ev merivê zana û balkêş zaniye ku ev av ne ji serê kaniyê hatiye.

Elodîno

Dibên di derên pêşîn de merivekî bi navê Elodîno hebûye. Merievekî pir qenc û camêr û mêvanperwer bûye. Her kes jê hez dikir, ewî jî ji her kesî hez dikir. Jiber ku bê qam camêr bûye, jê re Elodîno hatiye gotin. Lê beko û ewanan û hesûd û nevênan jê çavnebarî dikirin. Li ba mîrê wê çaxê giliya wî dikin û weha dibêjin:

"Mîrê me, Elodîno yê bê edeb dijûnê te kiriye û jin û makê te kişandiye û tiştê nerind di heqê te de gotiye. Ev kirinên wî yên qirêj li zora me tê û em pir pê diqehirin." Di berî de jî şahidên derewîn jî hazir kiribûn.

Li ser gotina van hesûd û nevênan, Mîr gazî Elodîno dîke. Mîr gazî şahidan jî dîke. Şahidên derewker bi yek devî dibêjin:

"Belê belê, me van gotinên nerind û qirêj bi guhê xwe ji devê Elodîno seh kiriye û em ji bo Xwedê şahid in."

Li ser şehdeyiya van şahidên derewker Mîr li Elodîno vedigere û jê re dibêje:

"Ezê te wisa ceza bikim ku ti kes vî cezayî nexwaribe." Emrê zilamên xwe dîke û dibêje:

"Kincên wî jê derxînin û wî tazî bikin. Û bi deverûkî wî razînin erdê û li ser piştta wî findan pê bixin. Bila çizênawî bide kezeba wî kû car din guyekî weha nexwe." Zilamên Mîr mînanê zebaniyan Elodînoyê bê tewan (bê guneh) digirin û wî tazî dikin. Deverûkî davêjin erdê û wî rind girê didin. Findên pêketî datînin ser piştta Elodînoyê evdal. Mîr jî li wan kirinan mêze dikir. Elodîno zemanekî dirêj di bin vê ezab û şewatê de dimîne. Mîr lê dinêre û jê vê pîrsê dîke:

"Elodîno te di vê dunyayê de ji vê ezab û şewatê bêtir şewat dîtiye?"

Elodîno lê vedigerîne û dibêje:

"Belê Mîrê min, belê!"

Mîr dibêje: "Gelo ev çi ezab bûye?"

Elodîno dibêje:

"Rojekê mêvanekî birçî hate mala min, di mala min de jî ti tişteki xwarinê tunebû. Ew mêvan birçî rabû çû. Hê jî ew şewata wî ji dilê min derneketiye. Şewata wê bûyerê ji vê şewatê pir pir zêdetir e."

Mîr ji vê gotina wî pir pêjneke mezin hildide. Û emrê zilamên xwe dike, da ku findan hilînin. Elodîno dibêje:

"Bi serê bavê te dê ew hilnedin. Jixwe min derba xwe xwariye. Û findan jî cîhên xwe rind girtine."

Gelê Kurdan, em Kurd xwedî ne ji bo mîrên weha camêr û leheng re.

Biçîzî neçîzî qencelîzî

Dibên merivekî gundî diçe çolê û bi adodeyê qencelîz (rehê gîyayekê reş û bi poçik e, dimîne mişkê) dertîne. Merivek saf jî di wê de derbas dibî. Û jê dipirse, bira tu çi dikî? Mêrik lê vedigerîne:

"Ji xwe re qencelîzan dertînim."

Mêrik dibêje;

"Xêra bavê xwe tu adodeya xwe bidî min jî. Ez jî ji xwe re hinek derînim."

Mêrikê saf qencelîzan nas nake:

Adodeyê hildide dest pê dike ku qencelîzan derxe, di binê deviyekê de adodeyê dixê binê gîyayê qencelîzê. Nişkeve jiber adodeyê mişkekê derdikeve. Mêrik hema zû zû mişkê digire, dide ber diranê xwe ku biqêşêre û bixwe, dibe çîza çîza mişkê reben. Mêrik jî wî dide ber gezan û wiha dibêje:

"Tu biçîzî neçîzî qencelîzî!"

Çi bi bêhn e, nanê germ; çi bi quwet e, hespê nêr; çi şîrîn e, jin û mêr.

Dibên paşakî hebûye, keçeke wî ya pir rind û pir jî bi aqil û zana hebûye. Dilê wê û wezîrê babê wê dikeve hevûdu. Û dibin evîndarên hev. Wezîrê paşa wê ji paşa dixwaze, lê paşa nadiyê. Wezîr pir dikeve nav lava û fizaran. Pêşîra paşa bernade. Paşa xwe jê rizgar nake û jê re dibêje:

"Wezîr, ezê qîza xwe bidime te, lê sê pirsên min hene, ku tu bersiva van pirsan bibînî, ez dê qîza xwe bidim te. Lê ku tu nezanî, nadime te."

Wezîr dibê: "Paşayê min bibêje!"

Paşa dest pê dike û dibê:

"Çi bi bêhne? Çi bi quwet e? Çi şîrîn e?"

Ez sê roj li te mole didim, piştî sê rojan bersiva van pirsan ji min re bîne."

Wezîr van gotinên wî dipejirîne û diçe mala xwe. Dest pê dike li ser van pirsan diponije û mutale dike. Lê tu bersiv nabîne. Radibe diçe ba keça paşê û meselê jê re dibêje.

Keçik dibêje:

"Bersiva van pirsê hêsa ye."

Wezîr dibêje: "Çi ne?"

Keçik dibêje: "Bersiva ya yekemîn nanê germ, yê duyemîn hespê nêr, yê sêyemîn jin û mêr."

Piştî sê rojan wezîr radibe û tê ba paşa. Paşa jê re dibêje:

"Wezîr, te bersiva van pirsan zanî?"

Wezîr dibêje: "Belê paşayê min."

Paşa dibêje "Ka çi ne?"

Wezîr dest bi bersivan dike:

"Bersiva pirsê yekemîn nanê germ, yê duyemîn hespê nêr, yê sêyemîn jî jin û mêr."

Paşa lê vedigerîne:

"Te van bersivan çawa zanî, ji min re bi rastî bêje. Ger rastî nebêjî qîza xwe nadim te."

Wezîr dibê: "Paşayê min, ji te û ji xwedê çî veşêrim. Rastiya xwedê weha ye. Van bersivan keça te ji min re gotiye."

Li ser vê yekê paşa gazî keça xwe dîke û jê re dibêje:

"Ka ji min re bibêje te bersiva van pirsan çawa zanî?"

Keçik dibêje:

"Bavo min bersiva van pirsan weha zanî. Rojekê em ji bo geştê çûbûn çolê, di veğerandinê de gava ku em hatin berê gund, bêhna nanê germ ji gund de avête pozê min, jiber vê qasî min zanî ku tiştêkî pir bêhnweş nanê germ e. Yê duduyan rojekê min li ber pencerê Qur-an dixwend, siwarekî bi bez hat û li ber min de bihurî, jiber bayê wê rûpelên quranê li hev qelibîn. Ji vê jî min zanî ku hespê nêr pir bi hêz û quwet e. Yê sisêyan jî min rojekê derê oda we vekir tu û diya min razayî bûn. Rûyê we bi hev re zeliqî bû, min ta kî ji pora xwe jêkir xiste navbera rûyên we. Û min çawa jî kir di navbera rûyê we de derbas nebû. Ji vê jî min dizanîbû ku ji jin û mêrî ti tiştêkî şirîntir nîne."

Li ser van gotinan paşa qîza xwe dide wezîr. Gelê xwendayên xoşewîst bi nêrin cem me kurdan jin û mêrîti çî qas xweş û jînekê bîngeh e. Jibo jiyana însanan re divê her însan bi taybetî her kurd jî weha bin û jinan bi wînin û bilind bikin. Çawa ku mezinan gotine: "Jin û mêr, tevr û bêr." Çawa tevr bê bêr jî bê tevir nikarin tu tiştêkî bikin jin bê mêr û mêr jî bê jin jînê nikarin bajon û nikarin şaristaniyê bînin holê.

Ez van çend helbestên jêr ji wan re diyarî dikim.

Jin

Jin qenc û rind in xweş û şîrîn in
Qedirbilind in hevalên jîn in
Me xwedî dikin me dimijînin
Jînê geş dikin şahiyê tînin

Ew baxên me nin em şîn bûn di wan
Dayîka me nin em in lawên wan
Seydayên me nin em hîn bûn bi wan
Ew xîmên me nin jîn nabe bê wan

Divê xwenda bin hemî kar bi dest
Ji bona jînê çêbikin helbest
Ger azad nebin ew nebin serbest
Zarokên bînin dimînin bindest

Jinan rizgar kin ji kûl û kovan
Da ku em bijîn wekî mirovan
Ez im ciwanê dijminên hovan
Ji bo na jinan ez im dilovan

N.B.

Biratiya quling û roviyê

Rojekê quling û rovî gazî hev û din xwarinê dikin. Ewîlî quling gaziyê rovî dike. Quling li ser navê wî girareke bi keys çê dike û dixê sewîleke devteng û datîne ber roviyê. Û jê re dibêje:

"Fermo!"

Rovî serê xwe dixê sewîlê lê belê bi tu awayî serê wî naçe sewîlê. Rovî piştî ku bê çare dimîne, dibêje:

"Xwedê zêde bike." Û xwe dide paş.

Quling serî dixê sewîlê û bi awayekî rihet yek bi zikê xwe dixwe. Û zikê xwe rind têr dike, rovî jî birçî tê mala xwe. Dor tê roviyê bi fend, ew jî ji qulingê re xeber dişîne û dibêje:

"Siba tu mêvanê min î!"

Quling bersiv dide:

"Li ser ser û çavan vê gazîkirîna te dipejîrînim."

Rovî jî ji qulingê re danûkek bi keys çêdike û dirêje ser bergêşê (sifra) û ji qulingê re dibêje:

"Fermo!"

Quling û rovî li dora bergêşê rûdînin û dest bi xwarinê dikin. Quling bi nekîlan dest pê dike, lê çî feyde nikare yek libekê jî hilde. Xwe paş dide û dibêje:

"Xwedê zêde bike!"

Roviyê reş dest pê dike û bi zimanê xwe çî li ser bergêşê heye dialise û paqij dike. Quling jî birçî birçî radibe û diçe mala xwe.

Ê dizane jixwe dizane, ê nizane dibê baqê nîskan e

Dibêjin merivekî pir bê namûs, bi dek û hîle hebûye. Rojekê radibe û diçe ber bêdera yekî û jê galmast (genim) dixwaze û dixwe cûwalê. Ji xweyî genimê şûjin dixwaze, xweyî genimê jê re dibêje:

"Mala me nêz e, here ji mala me bîne."

Mêrikê bênamûs diçe mala xweyiyê bêderê lê şûjin naxwaze, dawa tiştê bênamûsê li keçika wî dike û jê re dibêje:

"Were carekê bide min!"

Keçik hêrsa xwe tine û xwe pê ve bernade.

Li ser vê yekê, bênamûs gazî bavê keçkê dike û dibêje:

"Keça te nade! nade!"

Bavê qîzikê gazî qîza xwe dike lê diqêre û dibêje:

"Qîza min bidê! bidê!"

Keçik bi emriya bavê xwe nake û xwe pê ve berdide.

Piştî ku bi qîzikê re bênamûsê dike, diçe dora bûka wî.

Bûk jî xwe pê ve bernade, bênamûsî dîsa gazî xweyî malê dike û dibê:

"Qîz dide lê bûk nade!"

"Xweyiyê malê gazî bûka xwe dike û dibêje!"

"Bidê! bidê!"

Bûk jî bê emriya xezûrê xwe nake û xwe pê ve berdide.

Piştî îşê xwe didomîne û şûjinê tine û cûwalê xwe bi aşûjinê ve didûrî û diqêste (def dibe, dicehneme) diçe.

Xweyî malê tê mala xwe lê jina xwe, bûka xwe û qîza xwe pir bê med û bê mirûşk dibîne. Ji wan dipirse.

"Hûn çima bê mede û bê mirûşk in?"

Jinika wî bersiv dide û dibêje:

"Tu merivekî bê xîret û bê namûs î."

Mêrik li ser vê yekê dipirse:

"Çima gelo?"

"Ew çi bênamûs bû te birê kire mala me?"

Mêrik dibêje:

"Çira?"

Jinik bersiv dide:

"Hate malê û li keça me dewa bènûmsiyê kir, keçik ser da lê qebûl nekir. Rabû ji te pirsî, te got bidiyê! bidiyê! Li ser gotina te keçik jî vî îşê qirêj qebûl kir, pişt re hate dora bûkê. Bûkê jî ser da nedaye, dîsa rabû gazî te kir. Te got bidiyê, bidiyê. Bûk jî bênew bû, dayê."

Li ser van gotinên jina xwe mêrik dibêje:

"Jinik min ji bo şûjinê digot, ne ji bo bênamûsiyê."

Mêrik gava meselê fêm dike, pêre radibe, çekê xwe hildide û dikeve pey mêrikê bênamûs. Mêrikê bênamûs gava ji dûr ve wî dibîne, ew jî meselê fêm dike û dest bi revê dike. Xweyî malê dide pey. Bênamûs berê xwe dide nava şova zeviya nîskan. Zû zû baqekî nîsk bi destê xwe dixê û xwe davêje pişt merivekî. Meriv dipirse:

"Birano dewa we çi ye?"

Bênamûs dibêje:

"Dawa me ev baqa nîskan e. Min vê baqa nîskê ji zeviya wî çand, jibo vê yekê dixwaze min bikûje."

Xweyî malê fedî dike ku mesela rastî jê re bibêje. Bênew dibe û waha bersiv dide:

"Ê dizane jixwe dizane, ê nizane dibê baqê nîskan e."

Etteheyatû keçê Fato, çermê hilîn xweyî hato.

Dibêjin rojekê merivekî diz, pezekê yekî didize, tine mala xwe û serjê dike. Ew bi koça xwe ve dixwin. Û çermê wî jî li mala wî dimîne. Mêrikê diz radibe dest bi nimêjê dike, gava ku di etteheyatû de rûtîne, dibîne ku li hemberî wî de xweyî pezê qesta mala wî dike. Di nav limêjê de bi aweyekî şeytanî gazî jina xwe dike û weha dibêje:

"Etteheyatû, keçê Fato, çermê hilîn, xweyî hatû."

Jina wî meselê fêm dike û zû zû çermê hildide û vedişêre. Xwediyê bizinê tê lê tu tişteki nabîne û vedigere.

Şeva kidikkûjê bihûrî

Di zemanê berê de toreke (edetekî) weha hebûye. Gava ku mêrekî bizewiciya, pêwîst bû ku di şeva ewil de li jina xwe bida û wê rind bikûta. Bi vî awayî wê bitirsanda û da ku tirsaxwe bixista ser. Ev toreya hanî hem li cem mêra û hem jî li cem jinan bûbû wek tişteki ferz.

Dibên, rojekê merivekî dizewice, gava diçe ba jina xwe, ka ji başiya wî bûye an jî nemêrtiya wî bûye, li jinikê naxe û bi awayekî xweş dest davêje, lê jinik xwe pê ve bernade. Mêrik dest bi lava û fizaran dike, lê jinik xwe dîsa pêve bernade. Bi vî awayî li wan dibe sibe. Şeva duyemîn dîsa wek şeva berê dike. Dîsa tu ray lê nabe û carekî din li wan dibe sibe. Mêrik neçar dimîne û diçe ba hevalekî xwe û meseleya xwe û jinikê jê re dibêje.

Hevalê wî jê re weha dibêje:

"Gava tu îşev çûyî balê, bi xwe re pisîkekî bibe û here û wî berde hundir. Car din pisîkê bigire û li ber çavê jinikê bi herdu piyê pisîke bigre û wî ji hev û du tîş bike. Gava ku jinik vî hikmê te bibîne dê ji te bitirse."

Dema ku dibe êvar, mêrik şîreta hevalê xwe bi cîh tîne. Piştî ku pisîkê ji hev diçirîne, dest davêje jinikê. Lê jinik dîsa xwe pê re bernade û jê re weha dibêje:

"Rebena şeva kidikkûjê bihûrî!"

Xelîl dibê bibir, Celîl dibê nebîr

Tê gotin, dema ku Xwedê emrê Îbrahîm ji bo qurbankirina kurê wî yê Îsmâîl dike, Îbrahîm radibe Îsmâîl girê dide û deverû davêje erdê û kêrê hildide da ku daxwaza Xwedê bi cîh bîne. Gava ku kêr li ser stûyê Îsmâîl dibe tîne, jê ve xûya dike ku kêr nabire. Çend carên din jî dibe tîne, lê kêr dîsa jî nabire. Hêrsa wî tê û digire kêrê li ser kevîrekî dide. Pê re kevîr wek penîr dibe du qet. Li ser vê yekê Ibrahîm Pêxember weha dibêje: "Kambax! Tu wek penîrê kevîr dibirî, lê çima goştê min nabirî."

Jiber gotinên Îbrahîm kêr tê ziman û weha dibêje: "Xelîl (Îbrahîm Xelîl) dibê bibir, Celîl (Xwedê) dibê nebîr. Ez jî mame di navbera du tiştan de."

Xwedê hefza me bike ji mekrê jinan

Dibêjin merivekî û jineke wî ya bi dek û hîle hebûye.

Rojekê jinik ji mêrê xwe re dibêje:

"Hûn mêr bi me jinan re sereder nikarin bikin. Dek û hîleyên me pir in."

Mêrik dibêje:

"Hûn jin çi ne? Navê we jin e û aqilê we kêma e. Mêr mîr e, sinsira dek û hîleyên we li me tu kar nikare bike."

Jinik lê vedigerîne û dibêje:

"Poşman nebe! Dek û hîleyên me çi ne, wê tu bibînî."

Rojek ji rojan mêrê jinikê radibe û diçe cot. Jinik jî xwe berdide sûkê (çarsiyê). Çend masiyan distîne û tê mala xwe. Firavîna mêrê xwe hazir dike, dema nîvro firavînê hildide û diçe ber cot. Li pê ku mêrik dest bi xwarina firavîna xwe dike, jinik jî masiyan hildide û diçe nava şovê. Masiyan di nav xetan de vedişêre. Li pey ku mêrê wê firavîna xwe dixwe, radibe dest bi cotê dike. Jinik jî ji dûr ve lê mêze dike. Gava ku tê dikeve xeta masiyan, hew dibîne ku masî derketin ser rûyê erdê. Bi lez gazî jina xwe dike û dibêje:

"Ka were were, jî xetan masî derketin."

Jina wî dibeze balê û masiyan berhev dike. Mêrik dibêje:

"Jinik van masiyan êvarê ji me re bipêje."

Jinik jî dibêje: "Baş e, ez ê bipêjim."

Jinik masiyan hildide û berê xwe dide malê, li malê masiyan baş vedişêre. Êvarê gava mêrik tê male, şîva wî wek her car datîne berê. Gava ku mêrik şîvê bê masî dibîne, dipirse:

"Jinik ka ew masiyên ku ji şove derketibûn?"

Jinik bersiv dide:

"Mêrik tu dîn bûyî, şov û masî? Meriv dibê te li çolê giyagêj xwariye." Mêrik bi hêrs dibêje:

"Hey keça kerê! Ji te re dibêjim ka ew masî?"
Jinik carekî din li mêrik vedigerîne: "Welle tu xûrûfîy.
Ji westanê aqilê te jî ji serê te çûye. Tiştêkî weha eletewş
nabe."

Mêrik: "Bi dîn û îman gava ez rabim, ez dê te
bipelêxim." Pê ve dide darê û dikeve ser jînikê. Jinik jî
qêran dide û dibêje:

"Hey lo hewar e! hey lo hewar e! Gelî der û cîranan
werin mêrê min dîn bûye."

Der û cîran bi dengê wê dihesin û tev bi hev re dibezin
mala wan. Lê dinêrin, çi? Mêrik çavsor û har bûye û
ketiye ser jînikê. Xwe bi lez davêjin ser û bi milê mêrikê
digrin.

Dibêjin: "We xêr e?"

Jinik dibêje: "Welle mêrê min dîn bûye. Ji min re dibêje,
ka ew masî ku min di xeta şovê de girtibû, te çima wan ji
min re ne pehtiye? Hûn û Xwedê werin li aqilê wî
binêrin."

Li ser van gotinên jînikê der û cîran dibin yek û ji rê
dibêjin:

"Şov û masî!"

Li ser vê yekê mêrik şermezar dibe û mat dibe.
Bi xwe bi xwe bi hêrs dikeve û di devê xwe de
dilîblîbîne:

"Xwedê hefza me bike ji mekrê jinan."

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Biçîzî neçîzî qencelîzî

Dibên merivekî gundî diçe çolê û bi adodeyê qencelîz (rehê gîyayekê reş û bi poçik e, dimîne mişkê) dertîne. Merivek saf jî di wê de derbas dibî. Û jê dipirse, bira tu çi dikî? Mêrik lê vedigerîne:

„Ji xwe re qencelîzan dertînim.“

Mêrik dibêje:

„Xêra bavê xwe tu adodeya xwe bidî min jî. Ez jî ji xwe re hinek derfînim.“

Mêrikê saf qencelîzan nas nake:

„Adodeyê hildide dest pê dike ku qencelîzan derxe, di binê deviyekê de adodeyê dixê binê gîyayê qencelîzê. Nişkeve jiber adodeyê mişkekê derdikeve. Mêrik hema zû zû mişkê digire, dide ber diranê xwe ku biqêşêre û bixwe, dibe çîza çîza mişkê reben. Mêrik jî wî dide ber gezan û wiha dibêje:

„Tu biçîzî neçîzî qencelîzî!“